BERBANG

Organa Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê ★ Sal:6 Hejmar 6/87 (39)

BERBANG
Organa Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê
Organ för Kurdiska riksförbundet
Berpirsyar / Ansvarigutgivare:
K. Îzol
Serekredaktor / Chefredaktör:
R. Zîlan
Redaksiyon / Redaktion:
M. Bekir, J. Kurdo, R. Simo
Karê teknîkî / Sättning och layout:
Broyê Macîr

Navnîşan / Adress:
BOX 45205
104 30 Stockholm

Navnîşana serdanê / Besöksadress:
Hornsgatan 80, 1tr. Stockholm.

Telefon:
08/68 60 60

Postgiro:
64 38 80 - 8

Aboneti / prenumeration:
Kes / Enskilda: 100 Skr./sal-år
Meqam / Myndigheter: 200 Skr./sal-år

Agahdarî / Annons:
Rûpela paşîn / Baksida: 2000 Skr.
Rûpelên navîn / Insidor: 1000 Skr.
Nîvrûpel / Halva sidan: 500 Skr.

ISSN - 0281 - 5699

Redaksiyon ne berpirsyarê nivîsarên bi îmze û axaftinên Federasyonê ye. Nivîsarên ji Berbangê re tên şandin, heke çap jî nebin, lixwedî nayên vegerandin.

Bergê pêşin:
Kongra 7-em ya Federasyonê

Foto: Şoreş Zîrek

Bergê paşîn:
Anton Mirzoev, Divornik 1972

Sal: 6 Hejmar: 1/87 (39) 4.4.1987

Xwendevanên hêja,

Nêzîkî 3 meh in ku kovara me Berbang neketiye destê xwendevanên xwe. Ev hejmara me jî wek hûn dizanin gelek dereng ma.

Em kesên ku bi derxistina Berbangê mijûl dibin, vî kêmasiya xwe baş dizanin û dibînin. Ev pirsa, hem di civînên Komita Kargêr hem jî di civîna redaksîyona Berbangê de bi dûr û dirêjayî hatiye peyivandin.

Lê pirsên me tenê bi vî naqede.

Divê em baş bizanibin Berbang ji ber çi dereng dikeve û di wextê xwe de çap nabe. Sebeb gelek in. Hin ji van sebeban ev in.

Piştî kongra me ya 7'em piraniya organên Federasyonê hate guhartin. Gelek hevalên nûh ketin Komîta Kargêr û Komîta Gîştî. Paş kongrê valayiyek di vî warî de peyda bû. Heta hevalên nûh ku li organan cih girtibûn hatin ser hev û programa xwe ya xebata pêşeroj pêkanîn, wexteke dirêj derbas bû. Ji bo berpirsiyariyên kar û barên Federasyonê û Berbangê hevalên nûh tesbît bûn. Redaksiyona Berbangê hat tesbît kirinê. Hemû van tiştên ha gelekî wextên me girtin.

Derveyî van, karûbarê dîtir ya Federasyonê û bûyerên ku li welatê me çêdibin em mecbûr kirin ku bi karên rojane ve zêdetir mijûl bibin. Paş rojên kongrê, roja yeksaliya kuştina Serokvezîrê Swêd, Olof Palme, nêzîk bûbû. Ji bo vî yekê pêwîst bû gelek karûbar çêbiya. Pêwîst bû em wek Federasyon bi awakî aktif di vî rojê de beşdarbûna xwe bînin cih.

Paş van xebatan, êrîşa hov ya rejîma Tirkiyê li Kurdistana Iraqê destpêkir. Dîsa wek Federasyon pêwîst bû ku em bi her awayî vî êrişê protesto bikin. Me bi belavokekî, hemû rêxistin û kesên kurd û swêdî li ser van bûyeran agahdar kir. Di 7'ê meha Adarê de bi beşdarbûna gelek rêxistinên sîyasî û demokratîk, meşekî protestoyê li dij sefarata Tirkiyê pêkhat.

Lê xebatên acîl li ber me hîn jî neqediyabûn. Haziriya pîrozkirina Newrozê pêş me de bû. Wek hûn dizanin haziriyeke wisa gelek wext distîne.

Êdî paş van xebatên jorîn bîna me piçek vebû da ku em dikarîbûn dest bi kar û barên Berbangê bikin.

Wek tê zanîn, derxistina kovareke kurdî ne êsan e. Kesên nivîskar, zimanzan û alîkarên kar û barên teknîkî divê. Organîzekirina van xebatan divê.

Di vî warî de çi ji destê me dihat û li gora keweta me, hatiye seferber kirinê. Lê carnan ev jî têr nake.

Derxistina kovara Berbangê karekî kollektifî ye. Ji gelek aliyan ve alîkarî divê. Lê mixabin pir caran ev barê giran li ser çend hevalan dimîne, ji karê kolektifî derdikeve. Ev kêmasiya divê ji bingehê xwe bê halkirinê û xebat bi awakî kolektîfî bê meşandin.

Hêviya me ya mezin ew e, ku hevalên xwendevan, nivîskar, kesên zimanzan û komelên me yên endamên Federasyonê, alîkarî û piştgiriyên xwe zêdetir bikin, xwedî li Berbangê derkevin.

Heta hejmareke din, hûn bimînin di xweşiyê de.

Keya Îzol

www.KurdishLibrary.org

Hukumata faşîstê Turkiyê hate protesto kirin

Foto: Azad

RESOLUTION

Rejîma faşist ya Tirkiyê dîsa êrîşê Kurdistana Iraqê kir. Di roja 4.3.1987-an de, 30 balafirên leşkerî ya Tirkiyê, bi destûra rejîma faşîst ya Iraqê êrîş bir ser axên rizgarkirî û 9 gundên sivîl li Kurdistana Iraqê bombebaran kirin. Ev êrîşa çaran e ku di nav du salên dawî de çêbû. Li gor malûmatên karbidestên Tirkiyê nêzîkî 200 kes di van êrîşan de hatine kuştin. Lê evmalûmatana jirastiyê gelekî dûrin. Bi sedan zarok, jin, pîr û kal jiyana xwe di vê êrîşê de winda kirin. Zerarên madî gelekî mezine.

Ev êrîşa hov ku rûyê hukumata Tirkiyê ya rastî nîşan dide, li dijî hemû peymanên navnetewî ye ku mafê gelan garantî dikin.

Dewleta Tirkiyê endame li Koma Netewan, Konseya Ewrûpaye û îmzayê xwe avêtiye bin peymana Helsînkî. Hemû ev merciyên navnetewî hereketên wisa êrîşkar qedexe kiriye. Lê dîsa jî rejîma hov ya Tirkiyê li ber çavên cîhanê siyaseta xwe ya gelkûjî li hember gelê kurd didomîne.

Em rêxistinên jêrîn bi her awayî vê êrîşa hov ya rêjîmên faşist ya Iraqê û ya Tirkiyê mahkûm dikin.

CUD, Yekîtiya Nîştimanî Kurdistan, Tekoşîn liqê Swêd, KUK-SE, KIP, Kawa, TÎP, Ala Rizgarî, Partiya Hevgirtina Gel, Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê, YKDK, ISF, SOKSE, KSSE, AKSA, ISTIB.

Di 4-ê Adara 1987-an de, hukumatê faşîstê Tirkiyê careke din bi balafirên lêşkerî erîşeke giran bir ser Kurdistana Başûr û gundên kurdî, wargehên pêşmergeyê qehreman bombebaran kirin. Êrîşa hov ji alî 30 balafirên leşkerî pêk hat û bi sedan mirovên bêparastin hatin qetilkirin.

Ev êrîşa ne cara yekem bû. Di hundirê çend salên borî de leşkerî Tirkiyê aşîkare û bi destûra rêjîmê faşîstê Saddam van erîşên nemirovî û li dij peymanên navnetewî pêktîne. Ew dixwazin tevgera rizgarîxwaz a Kudistanê bifetisînin. Lê gelê me ji êrîşan wan re stuyê xwe xwar nake.

Ji bo protestokirina êrîşa Turkiyê li ser Kurdistana Başûr, Federasyona me belevokek bi zimanê swêdî di eynî rojê de derxist û êrîşa hov protesto kir. Ew belevok ji hemû rêxistinên siyasî û civakî û herweha ji hemû sefaretên li Swêdê re hate şandin. Di roja 7.3.1987-a de jî Federasyonê

meşeke protestoyê li dij sefareta Tirkiyê amede kir. Di meşê de gelek rêxistinên Kurdistanî û pêşverûyên tirk û ereb û suryanî beşdar bûn. Gelek rêxistinên siyasî û demokratîk binê teksta protestoyê li dij hukumatên Iraqê û Tirkiyê îmze kirin. Berî ku meşa protestoyê dest pê bike, parlamentê Partiya Karkerên Sosyaldemokrat, abûkat Hans Göran Franck û parlamentê Partiya Komûnîst a Çep Oswald Söderqvîst yek axaftin kirin û di axaftinên xwe de bi xurtî erîşa hov protesto kirin. Piştî axaftinên parlementan, axaftinek jî li ser navê Federastyonê hate kirin. Radyoya Swêdê di cîhê meşê de beşdar bû û bi axaftvanan re întervju çêkir. Întervjû sererast hate belavkirin. Roja dinê jî rojnamayên Swêdê yên mezin, Svenska Dagbladet û Dagens Nyheter qala meşê kirin û cî dan axaftina parlementan û berpirsyarê Federasyonê.

Di meşa protestoyê de 250 kes beşdar bûn û li pêş seferata Tirkiyê teksta protstoyê hate xwendin, slogan li dij Tirkiyê û Iraqê hate gotin û bi xwendina Ex Reqîb dawiya meşa protestoyê hat.

Çawa Federasyonê roja 4-ê Adarê belevokek derxist, ji komeleyên xwe yên endam re jî şandin. Komeleyên endamên Federasyonê ew belavoka li bajarên xwe; Uppsalayê, Sundsvalê, Söderhamnê, Bollnäsê, Hudîksvalê û Göteborgê li xelqê Swêdê belav kirin. Bi vê awayî bi hezaran belavok jî li dij rêjîma faşîstê Tirkiyê hate belavkirin.

Axaftina parlamentê sosyal demokrat, abûkat Hans Göran Franck

Di 4-ê adarê de, 30 balafirên leşkerî yên Tirkiyê êrîş bir ser neh gundan li welatê cîran Iraqê. Êrîşa Tirkiyê seet 8-ê sibehî destpêkir û gundên Sîral, Êra û Aramîş li nêzîkî bajarên Iraqê hate bombekirin.

Leşkerên Tirkiyê herweha ketin sînora Iraqê jî. Çend roj berî bombebaranê, balafirên Tirkiyê li mintiqê firiya bûn.

Li gor taxmînan xelqê sivîl zirareke mezin dîtiye, lê heta niha xeberek derbarê jimara kuştiyan û birîndaran nehatiye.

Ev ne cara yekem e, ku leşkerî Tirkiyê bi vê awayî êrîş dibe ser gundên kurdan. Êrîşên weha gelek caran pêk hatine û Turkiyê şê caran êrîşên xwe vekirî beyan kiriye. Hîn sala çûyî, di meha tebaxê de jî Tirkiyê êrîş biribû ser gundên kurdan. Wê demê, wekî niha êrîş bi agahdariya hukumeta Iraqê pêk hatin.

Hukumeta Swêdê bi xurtî ji êrîşa tebaxê mesafe girtibû û diyar kiribû wekî ev erîşên weha tenê dibin sedema şîdetê di navberê rêjîma Tirkiyê û grûbên kurdan.

Niha jî divê em bi xurtî ew êrîşên leşkerî yên nû mahkum bikin û ji Tirkiyê derhal sekinandina van êrîşan bixwazin, ku careke din êrîşên weha pêk neyên.

Rêjîmê Tirkiyê mecbûre ku zerar û ziyanê xelqê sivîl bide.

Wek sedemê vê êrîşa hov, hukumatê Tirkiyê beyanê xwe de dibêje ku êrîş li dijî wargehên PKK yên gerîlla bûn. Lê li wê mintiqê tenê çend sed

Foto: Azad

leşkerên PKK hene. Lewra jî armanca êrîşa leşkerî yê mezin tiştên dinin.

Di bingehî xwe de sedemê êrîşê destpêka polîtîka Tirkiyê ya gelkujî ye li hember gelê kurd. Divê Tirkiyê hemû êrîşên li dij gelê kurd bide sekinandin û hurmeta mafên gelê kurd bike.

Li Tirkiyê, ku piraniya kurdan -8 mîlyon- dijîn, ji alî resmî de wek kurd nayên qebûlkirin. Li wir, li gor karbidestan tenê tirk dijîn. Qîymet nedayîne kurdan û ew wek tirkên çiyayî tên binavkirin.

Gelê kurd li Tirkiyê di bin zordestiyê de dijîn. Zimanê wan qedexe ye. Pirtûk û rojnameyên kurdî qedexe ye. Kurd bi tu awayî nikarin li kultura xwe xwedî derkevin. Kurd tenê li ber dadgehan dikarin bi zimanê xwe bipeyivin. Gelê kurd piştî hatina cuntaya leşgerî li Tirkiyê grûbê herî bindest e.

Divê li rojhilata Tirkiyê rewşên wisa pêk bên ku hemû grûbên etnîk bikaribin bi hev re bijîn, ji pêşveçûna aborî û sosyal para xwe bigrin, kultura xwe biparêzin.

Tiştekî gelek tabîî ye, ku gelê kurd li hember zordestiyan derdikeve. Piraniya wan li hember zilm û zordestiyê bi rêyên aşîtî dixebitin. Xebata çekdar li dij rejîmên zilimkar ya Iraq û Tirkiyê jî heye û berdewam e.

Çarenûseke bi rêya aşîtiyê li welatên ku kurd lê dijîn tenê bi qebûlkirina heqê xwemuxtariya kurdan û giramî rêdan ji bo mafên kurdan ve mumkun e.

Kursa Tercumanan

Şoreş Zîrek

Li ser pirs û pirsgirêkên tercumanên kurd pir caran û li gelek ciyan dihat axaftin. Daxwaziyek xurt hebû ji bo çareserkirina pirsên tercumanên kurdan. Bi tevkarî û alikariya Federasyona komelên Kurdistanê li Swêdê, Enstîtuya Tercuman û Wergêran li zanîngeha Stocholmê û Komela Tercumanên Swêdê, kursek ji bo tercumanên kurdan li Xwendegeha Gelerî ya Bilind li Västerhaningeyê amade kirin.

Mamosteyên Xwendegehê ya beşa kurdî, heval Reşo Zîlan û Ferhad Şakilî bi dilxweşî ev karê hêja girtin û ji bo pêkanîna vê kursê alîkarî kirin. Bi kurtî armanca vê kursê ew bû ku:

1-Di vê kursê de li ser pirsnasiyên kurdî û swêdî xebat bikin û berhema vê xebatê berhev bikin û belav bikin.

2-Di vê kursê de li ser herdu zaravên kurdî -kurdiya jorîn û ya jêrîn- xebat bête kirin ku di aliyê pirsnasiyê de herdu zaravên kurdî nêzîkî hevdu bibin. Di vê têkiliyê de pêngavek bête avêtin.

3-Xwendekarên vê kursê jî, bila ji herçar beşên Kurdistanê be. Taybetî ji bo keç û jinên kurd kontenjanek bête veqetandin.

4- Tercumanên kurd jî di azmûnê (îmtihan) dewletê yê ji bo tercumanên desthilatê tên kirin de biserkevin.

5-Di pêşerojê de li gor imkanên xwe li zanîngehên Swêdê de beşek tercumaniyê û wergeran ji bo zimanê kurdî were vekirin.

Kursa tercumanên kurd di navbera 7.1.1987 û 27.2.1987 de li Xendegeha Gelerî ya Bilind li Västerhaningeyê pêkhat. Di vê kursê de 16 xwendekar beşdar bûn ku ji wan 5 kes keçên kurd bûn.

Ew pirsnasî (termînolojî) û peyvên di vê kursê de hatine berhevkirin ewê di pêşerojê de bête belavkirin. Armanc ew e, ku ew peyv û pirsnasiyên hatiye berhevkirin divê di nav gel de were belavkirin û li ser şaşî û kêmasiyan bête axaftin.

Di roja dawiya kursê de min ji çend hevalên beşdarên kursê, derbarê kursê fikrê wan pirsî. Bersivên wan li jêr dinivîsim.

Bareş Bate:

Cara pêşîn e, ku kurd ji hemû perçên Kurdistanê di vê kursê de beşdar dibin. Di vê beşdarbûnê de xuya kirin ku em kurd yek netewe ne û zaravên zimanê me kurdî pir nêzîkî hev in û zimanekî dewlemend e. Zaravên soranî û kurmancî di demeke kin de dikarin bighên hevudu. Lê divê em bi tenê bicorekî tîp binivîsînin. Li gor baweriya min ew tîp jî gerek tîpên latînî bin.

Azad Hesen:

Ev du salûnîv e, ku ez li Swêdê me. Min di çend kurs û xwendegehan de zimanê swêdî xwend. Lê bi rastî min gelek tişt li ser civat û sîstema Swêdê nizanî bû. Ew kursa ku nuha em diçinê pir alîkariya min dike. Ez zanîna xwe ya li ser civata Swêdê zêde dikim û peyvnasiyên swêdî û kurdî hîn dibim.

Di vê kursê de em hînî sîstema Swêdê ya polîtîk, aborî civakî h.w.d dibin. Ew gelek pêwist e, ji ber ku em di vê civatê de tercumaniya zimanê kurdî dikin. Divê em civata Swêdê baş bizanin ku em dayin û standina xwe tev swêdiyan têkuz bikin.

Mustafa Xoxe:

A girîng di vê kursê de, me û hevalên tercuman hev naskir, li ser kêmasiyên karê xwe axaft. Em meselên cur-cure dixwînin, wek pirsên tendurîstî, bazara kar, sigorta civakî û dadgehî yê rojane. Em pirsnasiyên swêdî û kurdî jî dixwînin û li ser van pirsnasiyan dixebitin.

Em hêvîdarin ev cure kurs tim hebin, ji bo ku rê bête xweşkirin ji bo hevalên paş me de bên. Divê ji bîra me neçe, keç û jinên kurd jî di vê kursê de beşdar bûn. Ev tiştek pir hêjaye, jina kurd dide xuya kirin rola xwe ya girîng di civata gelê kurd de, çi li Kurdistanê, çi jî li dervayê welat.

Kemal Kerîmî:

Nivîsîn û xwendina kurdî bi latînî niha ji berê ji me re hesantire piştî vê kursê. Piraniya wuşeyên kurdiya serû û xwarû bi baweriya min nêzîkî hev in. Bes rexna me li ser nivîsîna latînî heye ku wek hev naye nivîsandin, herkes bi meyla xwe dinivîse. Di vê kursê de hevalên kurdên jorîn hewlê xwe pir nedaye ji bo fêrbûna nivîsîna kurdî bi elfaba erebî (kurdî xwarû). Ez nizanim çima heval xwe naêşinin.

Cotkar:

Heta îro tu danûstandiyên min bi kurmanciya jêrîn çênebûn. Di vê kursê de ye ku cara yekem ez bi kurdên soran re dipeyvim. Ji bo min ev kursek gelek baş bû. Ji ber ku berê min qet kurdiya jêrîn fam nedikir, ew ji bo min wek zimanekî din bû. Lê îro ji bo min ew tişt hatiye guhartin. Ez dikarim, ne bi tevayî be jî, kurdiya jêrîn têbighêm.

Çi mixabin, ev kurs gelekî kurt bû. Dil dixwest ku kursek dûrûdirêj be.

Şirîn:

Alîkariya vê kursê ji min re bû. Berê çend caran bang min dikirin ez ji paneberên kurdên jêrîn re tercumaniyê bikim. Lê mixabin min nedikarî bû ji wan re tercumaniyê bikim. Ji ber ku min kurdiya jêrîn baş fam nedikir. Ez di vê baweriyê de ma ku niha ez dikarim, bi hindikayî be jî kurdiyê jêrîn têbighêm. Heta niha pirsek wisa di serê min de çênebûbû ku ez tîpên kurdiya jêrîn fêr bibim. Lê di vê kursê de min ew pêwîstiya dît û niha ez hînî tîpên erebî bûm. Ez dixwazim bi dilûcan hînî kudiya jêrîn bibim.

Di Nivê Paşîn Yê Sedsala 19-an de Rewşa Kurdan

Nivîskar: Celîlê Celîl
Werger: Reşîd Simo

Kurd bi koka xwe ji êlên kevinin. Ew li rojavaya kaşên rojhilata çiyayên Torosê ta bi Zexerosê rûdiniştin. Beşê rojava bi navê Zexerosa Kurdistanê ye.(1)

Suruştina çiyayînî şopên xwe yên eşkere li ser pêşketina gelê Kurd hêştine. Zincîrbendên çiyayînî yên ku gelî û newalan dibirin, ganhev û pêwendiyên aborî di nava xelkê de sist dikirin. Hebûna, çêrîgehên çiyayînî jî ji aliyekî din ve, dihêşt ku xelk bi xwedîkirina pez û deweran rabin. Ev yeka ha, ji mêj de, ji piraniya gelê Kurd re bûye bingehê aboriyeke serekîn. Di mehên havînê de, êl bi pezên xwe ve bi ber zonana de diçûn, li dawiya payizê li malên xwe vedigerîn, ta ku zivistanê biborînin. Şînayên deştê jî bi çandinê re mijûl dibûn.

Di destpêka sedsalên navîn de, gelek ji êlên Kurdan ber bi bakur û rojava de hatin, ew li çêrîgehên nu digeriyan. Hatina wan bi ber baqur de, ûştin polîtîkî jî jê re hebûn. Piştî şerê Çêldiranê di sala 1514-an de û parvekirina Kurdistanê li cara yekê di navbera emperetoriya Osmanî û Sefewî de, bi alikariya Mela Edrîsê Kurd, sultan Selîmê Yekê, bi dirêjiya sinorê Tikiye û Îranê di ber çemê Aras re ta bi jêr ku bi navbera herdu çeman (Mêzopotamiya) gihîne, Kurd rûniştandin, ta ku sînorên xwe yên rojhilat ji Îranê biparêze.

Dîroknivîsên Girêkî û Bîzentî Kurd wek miletekî xwedî xûyeke şerevan salix dane, ji azadiyê hez dikin. Rewşa wan ya serbixwe nehêşt ku bi dirêjiya sedsalan ne Girêkî, ne Bîzentî, ne Tirk, ne Silcokî û ne jî Tatarên Mengolîst yên êrîşker binyata wan hilweşînin. Heyanî piştî parvekirina Kurdistanê jî di navbera Turkiyê û Îranê de, hukmê her du dewlatan di sere bû. Êlên Kurdan dikarin sînorên Tirkiyê û Îranê bibirin û hemwelatiya welatê din bistînin. Dîroknivîsê Kurd Şerefxanê Bedlîsî nivîsiye ku: "Mezintirîn sultanan û xwedî cihên bilind nedikarîn welat û axa Kurdan bistînin. Bi tenê Kurdan diyarî ji wan re pêşkêş dikirin û xwe bi ser wan ve dijmartin û guh li wan dikirin, ew jî ji ber pêwistiya ku wan di leşkerê alîkar de bi kar hûnin".(2) Lê bi rastî Kurdan serxwebûna xwe ta bi nîvê yekê ji sedsalê nozdan parastin.

Cîgehê ku Kurdistan di nava Rojhilata Navîn de distîne, ew ji mêj de bûye çaterêyeke giring ji rêyên bazirganan re, di navbera Asiya û Eewripa de. Ev giringiya stiratîcî û polîtîkî ya gewre ji Kurdistanê re, di sedsalê nozdan de bêtir giring bû, ji ber ku ew dema ha dema xurtbûna siyaseta kolonyalî ya dewletên Ewripî yên gewre di rojhilat de bû.

Kurdistan û Ermenîstan ji kevn de û di sedsalên navîn de, ji dewletên cîrandar re meydana gelek şerên mezin bûne. Ew bi ber êrîşên Tirkên Silcokî û Tatarên Mengolîst yên koçer ketine, niha jî ew bûne cigehê li hevketina kelkên siyasî jî dewletên Asiya û Ewripa re.

Aboriya navçeyên rojhilata emperetoriya Osmanî di qonaxa ku em li ser peyîftine, di rewşeke gelekî dijwar re diboriya. Çandin di herêmên Kurd û Ermenî de gihîştibû ji berhevketineke mezin. Ew jî ji ber paşmayina hêzên berhemîdariyê û nîrên pêwengên berhemiya derebegî bûn. K. Mak Kiwan tenga paşmayina pêwengên çandiniyê yên ku li Tirkiyê bi kar dihatin nîşan dayiye, pêwengên karê cotkar û tevrê mirovê li şûn tayî hevdu kiriye. Noh jî ew bi kar hanî, yê ku di pirtûka pîroz de bi bîr hatiye.(3)

Di nîvê duduyan de, ji sedsala 19-an beşeke mezin ji Kurdan ji jîna nîvkoçeriyê dest berdan û bûne gundî. Wê yekê kir ku rista(sazûmana) êlîtiyê ji hev bikeve. Ew bi guhartinên aborî ve girêdayî bû, yên ku di çandinvaniyê de çê bûbûn. Serokê elê digel peyayên xwe kesên pepûk ji êlê bi hişkî diçewsandin. Wek nimûne, Kurdên ku di bin destê Cehfer Axa de, serokê êleke Kurd bû li Rûsiya, ji êla xwe dixwest ku hemî dexl û danê wî bi malê gihînin û belaş êzingan jê re werînin, li ser wan diviyabû jî dema ku keça xwe bi mêr bikin. S. Egîzarov nivîsiye û gotiye: Gotina gayê Cehfer mîna ferzeke pêwist û giran belav bû.(4)

www.arsivakurdi.org

Xukên hukmetê yên pir li ser pez û malê nerakirî dihêşt ku Kurdên gelekî xizan bibin, wek nimûne êla Caf(5) xûkek li ser xaniyan bi navê ''xercîxanî'' dida.(6) Ji bona ku xûkê bicivînin hin kesên pispor bi navê ''fodcox'' hebûn. Serokê êlê jî hin caran bi rola tehsîldariyê radibû. Tehsîldarên xûkê darê zorê ji bona civandina wê bi kar dihanîn û beşek ji xûkê ji xwe re dibirin. Li teniştxûka li ser malan, Kurdan gelek cirmên din jî didane serokên êlên xwe.

Rewş hîn gelekî pîstir jî bû, ji wan êlên Kurd re yên wek: Şîvzorî, Bîrsanî, Rawendozî, Siyorcî, Hêrkî û Kurî Zîbarî, ji bilî van jî yên ku li Tirkiyê dijiyan, lê wan bar dikirin Îranê ji bona çêrîgehên havînê. Ji ber vê yekê diviyabû ew xûkê bi du hukmetan bidin. 1/10 bi Tirkiyê bidin û xûkê bi hukumetaÎranê jî bidin, ta ku karibin çêrîgehan bi kar hûnin. Ger Kurd di axa Îranê de ya ku bi kêrî çandinê têye bimana, diviyabû xûka malan jî wan bidana. Ew jî li gor xwestina karbidestên hukmetê bû(7). Di bin wan xûk û bêşên giran de, hin êlên Kurdan bêtir bêtir dest bi jîna rencberiyê kirin. Hêdî hêdî aboriya wan bi aboriya çandinvaniyê hate guhartin. Ji ber ku êlê Caf yên nîvrencber jîna xwe bi rencberiyê guhartin û bi karê çandiniyê rabûn, êla Caf demsala zivistanê li Sulêmaniyê diborand. Li siyên sedsala 19-an êla Caf li zivistanê xwediyê hin erdên çandinê bû. Lê berê wan erdan têra wan nedikir, ew bêgav bûn ku dexlê û tiştên din bikirin. Fêrebûneke berbiçav di çandinê di destpêka pênciyan de li ser hesabê kirêkirina erdan ji derebegan çêbû, ew jî bi merca ku 1/10-an bidin û bi hin kar û barên din jî rabin. Ew ferebûna ha li ser hesabê destdanînê jî erdên beredayî û bûr jî bû.

Lê niha nema êlên Kurdan havînan diçine zozanan, bi tenê ew keriyên pezên xwe dişînin. Wek nimûne, êla Remek li navçeya Betwînê dijiya û keriyên pezên xwe dişandin çiyayên Qendîlê.

Kesên êlê yên ku xudan hin pezên hindik bûn, hêdî hêdî ew li ser axê bi cîbûn. Ger ew derketana koçeriyê jî bi tenê wek şivanan an karkerên alîkar bi derdiketin.

Komika Aristokratî(mal mezinan) ji êlê, ne bi tenê kesên êla xwe diçewsandin, lê belê xelkên rencber jî yên ku di çandinê de kar dikirin ew jî diçewsandin. Kesên ku li dijî êrîşên koçeran li ber erdê xwe didan, ewên ha berê xwe didan serekên êlan ta ku alîkariya leşkerî ji wan bixwazin. Di rewşên holê de cotkaran li xwe digirt ku beşê bidin serekê êlê. Bi rastî ew bi temamî diketin bin destê serekê êlê.

Karbidesrtên hukumetê jî ji aliyê xwe de ev pêwendiyên ha di navbera serdariya êlê de û xelkên rencber de çê dikirin. Holê ta ku hukumeta Îranê êlên Kurdan yên ku li Tirkiyê rûdiniştin bi aliyê xwe bixîne, ewê fermanine mezin bi destê serokên êlan ve berdidan. Wek nimûne, serokê êla Mameşî (Mameşiskî) Bêrût Axa, mafê wî hebû ku zorê li herêma Basfeyê bike û 1000 tomanî bistîne, jê 200 î ji xwe re bibe û 800 tomanên mayîn bispêre xezînê(10).

Hukumeta Tirkiyê serdariyên êlên Kurdan bi aliyê xwe de dikişandin. Agirê neyarîtiyê di navbera Kurd û Ermenan de pêdixist. Pir caran perçeyek erd dida derebegekî Ermenî û ew perçe bi xwe dida begekî Kurd jî.

Ta ku şîniyên binecî di bin destê wê de (hukumeta Tirkiyê) bimînin, ji serdariya êlên Kurdan re bêlûkin leşkerîn çekdar hebûn, piraniya wan ji kes û xizmên wan û ji mirovên xizan di êlê de bûn. Ew kesên ha çek, hesp û xwarin ji ber xizmeta xwe ve werdigirtin. Ew bêlûkên ha li dijî êlên cîrandar yên biçûk û yên koçer bi kar dihatin, bi pê keriyên pezên wan diketin. Civandina xûkê jî, ji karûbarên bêlûkên çekdar bû.

Neyarîtiya domdar(berdewam) ya ku di navbera serokên êlên Kurdan de hebû, dihêşt ku gund talan bibin, çandin wêran bibe û xelkên binecî bêne kuştin.

Piştgiriya hukmetê ku ji serdestiya êlan re dikir, dongiyin nebaş li ser pêşketina aboriya heremê bi temamî dikir. Ji ber ku cotkar tim bi ber êrîş û talanê ji aliyê hin êlan de diketin, pir caran ew ji jîna bineciyê bi ber jîna koçeriyê de diçûn. Wek nimûne: Kurdên binecî yên ji koka Kerxasiyan ji nuh de ew kom bûn û dest bi jîna koçeriyê kirin(11).

Herwisa xûk û beşên giran, standina curm û paciyê û êrîşên leşkerên hukmetê, dihêşt bêtir xelk bi ber jîna koçeriyê ve bête têvedan. Îlzî Rîklo li ser vê mijarê nivîsî: Wek nimûne, ger herêmek bi ber talana walî keve, an leşker tê re biborin, êlên Şîr-minîşîn yên ku hînî jîna çandiniyê bûbûn, dest ji gundên xwe berdan û dest bi jîna koçeriyê kirin, her wisa li hemberê jî, êlên Saxar-nîşîn di hin deman de li ser axa ku dane wan cih girtin(12).

Gelek navçeyên çandinê, ji ber nîrên bindestiya berdewam ve ji aliyê êlên koçer ve bûne çêrîgeh, wek herêma Abaxê li senceqa Wanê, ya ku piraniya xelkên wê ji Kurdên Yezîdî bûn, ew ji berê de, ji navçeyên li pêş bû, lê di destpêka sedsala 20-an de, xelkên wê navçê bû çêrîgeha pez û dewaran(13).

Serdariya olegîrî jî pir caran xizanî li ser milê xelkê girantir dikir. Şêxên dewlemend serdestiya xwe ya olegîrî bi kar tînan, mafên xwe bê sînor dikirin. Tiştekî biçûk ji xelkê derketa û bi dilê wan ba, weku ew ji emrê xwedê bi derketine. Gelek serpêhatiyên nas û navdar heye, ku çawa şêx malê ew xelkên reben distand, heye ku wan hinekî dayina xûkê bi derengî xistine.

Dûmahîk heye

Serekaniyên vê gotarê:

1- F. F. Mînoroskî, balkişînin û bîrhatinin.

2- V. Velîamînof-Zernof, Schrefname ou histoire des Kurdes par schref, Prince de Bidlis, t.II SPB, l862, p.34.

3- K. Mak Kiwan, Koloniya me ya nuh, teswîrkirina taybetiyên jugrafî, etnografî û aborî yên Tirkiya Asiyayî. Mosko 1886, r.282.

4- S. Egîzarof, Lêkolîneke bi kurtî ji bo Kurdên navçeya erîvanê. Kaxitên beşê Qafqasê yên kombûna emperetoriya Rûsî ya jugrafyî, pirtûk 113, çapxana Teflîsê 1891, r.16.

5- Êla Caf li navçeya Şehrezorê rûdiniştî.

6- Xorşît efendî, siyaset-nameya sînor, salixdana gerekê li ser sînorê Tirkî û Farisî. 1877, r.219.

7- Pirtûka berê r. 249-250

8- Pirtûka berê r. 218

9- Pirtûka berê r. 256

10- Pirtûka berê r. 257

11- G. Akabof, Li dora doza yekirina Kurdan wek neteweyekî (thêsehevjîn) Mosko 1952, r.217

12- Î. Rîklo, Mirov û erd, cild 11, 1887, r.168

13- Xorşîd Efendî, Siyasetnameya sînor, r. 290.

www.alisweknurd.org

Civînek li ser zimanê kurdî

Di rojên 13 û 14-ê çileya pêşîna 1986-an de, 12 zimanzan û tercumanên kurd li Stockholmê li ser zimanê kurdî civînek çêkirin. Civîn, ji aliyê Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê hate amade kirin.

Mebesta civînê di nameya ku Federasyonê ji zimanzan û tercumanên kurd re şandibû de, wisa hatibû diyar kirin.

''Îro li Swêdê li dora 8-10 hezar kurd dijîn. Nêzîkî nîvê wan piştî sala 1980-î hatine Swêdê. Gelek makamên Swêdê pêwîst dibînin, ku penaberên kurd li ser rewşa civata Swêdê bi zimanê kurdî agahdar bikin. Ji bo vê amancê jî maqamên Swêdê, karê tercumekirina materyalê agahdarî dispêrin tercumanên kurdî.

Tercumanên kurd di karê tercumekirinê de zehmetiyeke mezin dikşînin. Ji ber ku gelek peyvên swêdî di zimanê kurdî de tune ne, nehatine afirandinê. Tercumanê ku karê tercumekirinê daye ser milê xwe, li hember peyvên swêdî, ku di kurdî de nînin, ji alî xwe de diafirîne. Di netîceyê vî karê de jî zehmetî derdikve pêşiya penaberên kurd; ji bo peyveke swêdî çend peyvên kurdî derdikevin meydanê. Mînakek: Ji bo ''Statens Invandrarverk'' bi kurdî tê gotin: ''Daîra Mihaciran'', ''Daîra Karûbarê Mihaciran'', ''Daîra Karûbarê Biyaniyan'', ''Daîra Mihaciran a Dewletê'', Daîra Biyaniyan a Dewletê'' û hwd.

Ji bo ku ev pirsa halbibe, Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê biyar da ku bispêre endamên Redaksiyona Berbangê; Mihemed bekir, Reşo Zîlan û Reşîd Simo, ku civînekî bi zimanzan û tercumanên kurd re li darxin. Di civînê de, beşdarên civînê wê li ser peyvên swêdî bisekinin û li hember peyvên swêdî, peyvên kurdî biafirînin. Herweha di civînê de wê gotûbêj li ser vê karê ji bo rojên pêşî bê kirin.''

Roja duduya endamên civînê li ser karûbarê pêşiyê sekînin û gîhan wê baweriyê, ku ji bo xizmeta zimanê kurdî, komîteke zimanêkurdî pêwîste. Jibokarê tercumetiyê jî lazime tercumanên kurd bi hevre komîteke tercumanên kurd saz bikin.

Sersala kuştina Olof Palme

Di 28-ê meha sibatê de, ji bo bîranîna sersala kuştina Olof Palme, Partiya Sosyaldemokratan tevgereke mezin pêkanîn. Federasyon bi heyetekî ve di vî tevgerî de beşdar bû û çelengekî bi navê Federasyonê danî ser gora Olof Palme.

Li ser navê Federasyonê nameyekî bîranînê, ji bo malbata Olof Palme, ji Partiya Sosyaldemokratan û ji hukûmeta Swêdê re hate şandin.

Di eynî rojê de gelek kurd jî di meşa bîranînê de cih girtibûn.

Konferansek li ser zarokên ji Tirkiyê hatine

Di rojên 27-28.01.1987-an de li Stockholmê Barnmiljörådet konferansek çêkir. Konferans li ser zarokên ku ji Tirkiyê hatine sekinî. Di vê konferansê de nunerek bi navê Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê beşdar bû.

Armanca konferansê bi awakî zanistî û resmî li ser zarokên ku ji Tirkiyê hatine, agahdarî dayîn bû. Nêzîkî 130 kes ji çaraliyên Swêdê, nunerên belediyan, meqamên dibistanan û nunerên rêxistinan di konferansê de beşdar bûbûn.

Li gor programa konferansê ya durojîn wê tenê swêdî û tirk biaxiftana, herçend Federasyona me jî hatibû vexwandinê civînê. Nunerê Federasyonê, li ser mafê axaftina nunerên kurd bi serokatiya konferansê ve peyivî, rexnê û pêşniyarê xwe pêşkêş kir. Wan jî piştî demekê di rojevê de guhertin çêkirin û mafê axaftinê dan nunerên Federasyonê û Proja Kurdî.

Nunerê Proja Kurdî di axaftina xwe qala dîroka Kurdistanê û rewşa kurdên ku li Swêdê dijîn kir. Nunerê Federasyonê jî bi kurtî qala rewşa zarokên kurd li Tirkiyê û li Swêdê kir.

Axaftinên nûnerên kurd gelek bala beşdarên konferansê kişand. Gelek nunerên daîrên Swêdê pêşniyar kirin ku bi Federasyonê re civînên nû çêbikin. Li ser daxwaza wan Federasyon wê bi maqamên berpirsyarên zarokanre çend civînan çêbike.

www.arsiv-kurdi.org

JI KOMELÊN ENDAM JI KOMELÊN ENDAM

Şeva Bîranîna Olof Palme li Botkyrkayê

Di roja 30.01.1987-an (seet 18.30) de li Fittjayê şeva bîranîna serokwezîrê Swêdê Olof Palme çêbû. Belediya Botkyrkayê û Komela Verdandî şeva bîranînê amade kiribûn. Di şevê de Komela Latîn Emerîkayê, Komela Çanda Kurdî li Botkyrkayê, Komela Asûrîyan û Komela Tirkan, parlementer û nêzîkî 200 kesên biyanî beşdar bûbûn.

Bi navê Komela Çanda Kurdî, nunerê komelê heval Kemal li ser Kuştina Olof Palme axaftinek kir û spekulasyonên li dijî kurda mehkum kir.

Gruba folklora zarokan ya komelê û heval Zana jî di şevê de bi dîlan û stranên kurdî ve beşdar bûbûn.

Agahdarî

Komela kurd li Stokholmê dest bi weşanên radyoyê kir. Weşanên radyoya kurdî heftê carekî, di rojên duşemiyan navbera seet 17.30-18.00-an de, di kanala FM, pêla 88 Mhz de, tê weşandin.

Şeveke Kurdî

Rêxistinên xwendekarên Kurdistanê AKSA, KSUFû SOKSE di roja 10. 12. 1986-an de li bajarê Stokholmê şeveke çandî û hevgirtinê li dar xistin. Di şevê de li dora pêncsed mêvan beşdar bûn. Amadekarên şevê programeke gelekî dewlemend, stran, dîlan û tîyatro pêşkeşî mêvanan kirin.

Li ser vexwendina amadekarên şevê, Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê jî di şevê de beşdar bû û di masaja xwe ya ji bo şevê de diyar kir wekî yekbûna tevgera xwendekarên Kurdistanê daxwazeke gelê Kurdistanê ye û giringe. Her weha Federasyonê diyar kir wekî Federasyon bi her awayî amadeye ku xizmetê yekbûna tevgera xwendekarên Kurdistanê bike.

Şeva Bîranîna Komara Mahabadê

Di roja 24.01.1987-an de, Partiya Demokratê Kurdistana Îranê -liqê Swêd şevek bi helkevtina 41 saliya Komara Mahabadê li Bajarê Stockholmê li dar xist.

Di şevê de gelek welatperwerên kurd beşdar bûbûn. Piştî axaftina nunerên prtiyê, stran û dîlanên kurdî hate pêşkêş kirin. Di dawiya şevê de jî fîlmek li ser Kurdistanê hate nîşan dan.

Li ser vexwendina amadekarên şevê, Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê tevî bîranîna Komara Mahabadê bû.

Şeveke Kurdî li Botkyrkayê

Komela Çanda Kurd Li Botkyrkayê, di roja şemî 13.12.1986-an de li Fittjayê şevek li dar xist.

Di vê şevê de grûbên folklora Komela Jina û ya Komela Kurdistanê Li Uppsalayê, grûba zarokan ya Komela Çanda Kurdî Li Botkyrkayê û grûba komela Şîliyê lîstikên folklarîk pêşkeş kirin.

Dengbêjên kurd Brîndar û Feqiyê Teyra (Nîzamettîn Arîç) jî stranên kurdî ve şev geş kirin.

Şahiyek li Dibistana Gelêrî ya Bilind Li Västerhaninge

Di roja 12.12.1986-an de xwendekarên dibistanê li ser mafê gelên bindest şevek amade kirin.

Di şevê de nunerên Komela Welatên Çaremîn, Federasyonên Lap û Indîana beşdar bûn û li ser rewşa gelên xwe axaftin.

Federasyona Komelên Kurdîstanê Li Swêdê jî axaftinek li ser rewşa Kurdistanê kir. Nunerê Federasyonê di axaftina xwe de li ser supekulasyonên rojnamên Swêdiyan ku navê kurdan bi kuştina Olof Palme ve girêdidin, mehkum kir.

Di şevê de gruba folklora kurd, Govend jî dîlanên kurdî pêşkeş kir.

Kurdên li Bollnäsê cunta faşîst protesto kirin

Komela Kurd li Bollnäsê di 7-ê adarê de ji Alfta heta Bollnäsê meşek (20 km) pêkanî. Hemû kurdên ku li Ovanåker û Bollnäsê cîwar bûne, di meşê de beşdar bûbûn. Komelê belavokek bi swêdî jî belav kir.

Li ciyê mitîngê Brotorgetê, li ser navê komelê di axaftina xwe de Nurî Haco bala swêdiyan kişand ser rewşa Kurdistanê û got:

— Swêd dikare bêtir tişt ji bo me bike. Îro li dinê bêtir tişt ji bo kurdan nayên kirin. Qet dostên me tune. Yekîtiya Netewan temamen bêdeng e, her çiqas em dixebitin ku rewşa xwe bi bîr bînin.

— Em ban hemû partiyên ku giramiya mafên mirovî digrin, ku bira ew suc û qetlîamên hêzên leşkeriya tirkan li Kurdistanê mehkum bikin.

Ji bilî vê yekê, di 8-ê adarê de Xaçasor şevek amadekiribû û komela kurd li Bollnäsê vexwendibû weki di programê de cî bigre. Li ser vê vexwendinê, Komela Kurd Li Bollnäsê bi awakî aktîf û bi programekî dewlemend di şevê de beşdar bû.

www.arsivakurd.org

Mêrxas û Ronakbîrê Kurd
Necmettîn Büyükkaya

M. Ferzend Baran

23.1.1984. Rojeke reş û kirêt. Lê ew çend jî giring. Necmettîn Büyükkaya, welatparêz û şoreşgerê kurd, di vê tarîxê de hat kuştin. Li girtîxana bi nav û deng ya Diyarbekrê. Girtîxana eskerî. Tevî çar mêrxasên din.

Berî niha bi du salan dijmin dilê mêrxasekî rawestand.

Wext dibuhure. Pir zû, pir bi lez û bez. Tişt, bûyer û meriv ji bîr dibin. Teşqele, qîreqîr û erkên rojane do û tişt, bûyer û kesên do li pey jiyanê dihêlin. Tişt, bûyer û merivên ku do giring bûn, xwe dan cihekî giring bûn li pey mij û dûmana rojane dimînin.

Çima? Û kî ji vê yekê destkewtî dibe?

Bê guman zordar. Bê guman tawanbar û curimkar. Ew jê destkewtî dibin. Ew dil dikin ku tişt, bûyer û merivên do ji bîr bibin, perda mij û dûmanê bi ser wan re were kişandin. Ji ber ku zordar û tawanbar tarîxeke derewîn dinivîsin. Ji ber ku "rastiyên" wan li ser derewan ava dibin. Û wan, di van kirdeyan de, zor tawan divê. Derewekê, tu carî, bê zor û tawan nayê pê. Xwediyên derewan divê rastî û xwediyên rastiyan bixenîqînin da ku ew bikaribin derewên xwe ava bikin, bikemilînin.

Derew û xwediyên derewan, zordar û tawanbar, jî dost divên. Dostên ku bikaribin li hember dijmin, ango li hember rastî û xwediyên rastiyan rawestin. Ji zor û tawanê pê ve, jibîrkirin jî dosta derew û xwediyê derewan e. Yek ji yên herî baş.

Lê belê, di warê jibîrkirinê de, tiştekî divê ji bîr nebe; berdêlka jibîrkirinê jî heye... Bibîranîn.

Herçend jibîrkirin dosta derew û xwediyê derewan e, bibîranîn jî ewçend dosta rastî û xwediyê rastiyan e. Bibîranîn jî dosta mazlûm û bindestan e.

Tarîx şahîd e; şerê zordar û bindestan di eynî kat de şerê derew û rastiyê ye. Şerê derew û rastiyê jî şerê jibîrkirin û bîranînê ye. Bi gotineke din, du qorên esasî yên tarîxê weha dixuyin. Li alîkî bindest, rastî, bibîranîn û li alîkî jî zordar, derew û jibîrkirin.

Gava dewleta Fransê doza Cezayirê dikir û digot ku Cezayir eyaleteke Fransê ye, wê derew dikir. Dewletê dixwest ku dinya tarîxa Cezayiriyan jî bîr bike û dinya jî bîr bike ku Fransê bi darê zorê Cezayir vegirtibû û bi darê zorê hêjî li Cezayirê bû. Gava Naziyên Alemanyayê bi doza yekîtiya merivan û nijadeke paqij dest bi kuştina milyonan meriv û vegirtina welatên din kirin, wan derew dikir. Wan jî dizanibû ku yekîtiya merivan bi darê zorê nayê pê û doza nijadeke paqij xeyaleke kirêt e. Lê rastiyên wan li ser derewan ava bûbûn... Kîne, ku îroj naxwazin şerê Cezayirê û şerê cihanê yê duwemîn bi bîr bînin? Bê guman zordar û tawanbar.

Mîsalek jî ji me, ji tarîxa me; kî îroj naxwaze Şex Seîd, serîhildana Şex Seîd û bidarvebûna Şêx Seîd û hevalên wî bi bîr bînin? Bê guman zordarên me. Tawanbarên welatê me.

Ereb û Cezayirî îroj naxwazin tu carî şerê Cezayirê ji bîr bikin. Welatên ji şûrê Naziyan rizgarbûyî û Cihû îroj naxwazin bûyerên 1939-an ji bîr bibin. Em naxwazin Şêx Seîd, bûyerên 1925-an û kuştina welatperwerên Kurd ji bîr bikin.

Ango; bibîranîn dostake wefakar, çekekî xurt e. Tevî ku wext bi lez diherike, rabirdû, do, tişt, bûyer û merivên ku îroj tunene, divê ji bîr nebin. Tu tişt, tu bûyer, tu meriv divê ji bîr nebin.

Herweha Necmettîn Büyükkaya û hevalên ku pê re hatin kuştin jî.

Necmettîn Büyükkaya mêrxas û ronakbîrekî kurd, welatparêzekî kurd, welatparêzekî bêhempa û şoreşgerekî jêhatî bû. Sala 1943-an, wî cara yekemîn çavên xwe vekirin û li dinya malkambax fekir. Li maleke feqîr û neçar ku di gundekî feqîr û neçar de bû. Wî, bi hezar zehmetî, pêşî li Siwêregê û Adanê û paşê jî li Stembolê xwend. Fakulta Hukukê ya Stenbolê bû xwendegeha wî ya kurdperwerî û şoreşgeriyê jî. Dilê wî bi agirê welatparêzî û şoreşgerî hat sotin. Gava xwendekar û xortên kurdan, di dawiya 1960-an de, li Anqerê û Stembolê dest bi avakirina rêxistinên xwe, DDKO (Devrimci Dogu Kültür

www.arsivakurdi.org

Ocaklari) kirin, ew jî bi dil û can ket nav vê rêxistinê û bû serokê DDKO-yê Stembolê. Piştî Cunta Eskerî ya 1970-an li Turkiyê, ew ji Stembolê bi dûr ket û çû Kurdistana Iraqê, nik hevalên xwe, Dr. Şivan (Sait Kirmizitoprak) û yên din. Cara yekemîn hingî wî beşên din yên Kurdistanê, ji nêzîk ve, nasî. Bi dû kuştina Seit Elçî, Dr. Şivan, Brûsk û Çeko re, cih li wî û hevalên wî teng bû. Ew bêgav ma ku dev ji Kurdistana Iraqê berde. Ew hat Suriyê. Li Suriyê jî wî beşekî din yê welatê xwe nasî. Herweha tarîxa xwe jî wî Memduh Selîm, Qedrî û Ekrem Cemîl Paşa, Qedrî Can, Cîgerxwîn, Mele Hesenê Hişyar, Osman Sebrî nasîn. Ew bû şîrîkê derd û kulên wan, hesreta wan ya welatekî azad. Ew li nik wan bû şahîdê tarîxa babilîska bihistan ya Kurdistanê.

Bi dû salên ku li Suriyê bihurîn re, ew hat welatê ku em îroj tê de ne, Swêd. Li Swêd jî wî ziman, çand, edet, civat û merivên ewrupayî nasîn, ji wan destkewtî bû. Li welatê xerîbiyê, ji dûr ve wî li welat û çanda welatê xwe nihêrî û ew hîn xweştir nasîn.

Piştî efa giştî ya 1974-an li Turkiyê ew dîsan vegeriya welatê xwe. Ew roj weka niha tên bîra min; ew vegeriya bû welatê xwe, çanda xwe, zimanê xwe, nik merivên welatê bav û kalan. Çirûskên kêfxweşiyê ji çavên wî bi firê diketin. Wî heval û dostên xwe, merivên xwe hembêz dikirin. Wî dest û ruyê diya xwe radimûsî. Bi kurtebirî, ji kefa wî re payan tunebû.

Welat, merivên welêt, imkanên welêt weke lehiyekî boş li ber wî bûn. Wî dil û bawerî bi xebatekî xurt û siyasî hebû. Lê belê, hesreta salan li ser dilê wî bû. Ew tî bû. Wî dest pê kir, gav bi gav li welatê xwe geriya, ava hunik ya bîr û kaniyên nemrût, enzika Siphan, Agrî û Herekolê bi ser xwe re kir. Û ew bi destgirtî ya xwe, yara wefakar, dost û hogira qedirgiran Cemîle re zewicî.

Û wî, dîsan dest bi xebata xwe ya siyasî kir. Û heta ku ew di girtîxana malkambax ya Diyarbekirê de hat kuştin, wî xebata xwe ya siyasî domand.

Ez dizanim, ev çend rêzên hûr neheqiyekî mezin li Necmettîn Büyükkaya dike. Jiyana wî ne ew jiyan bû ku meriv bikaribe bi çend rêzan salûx bide. Jiyana wî helbestekî dirêj û bê dawî bû. Helbestekî dirêj, xurt, xweşik, kemilî û baş li hev hatî, rengîn û bi aheng.

Necmettîn Büyükkaya û jiyana wî jî divê, eynî bi vî awayî, were nivîsîn; bi awakî xurt, xweşik, kemilî, rengîn û bi aheng. Heye ku wext hê jî ji bo karekî weha zû be. Lê em divê ji bîr nekin ku erkekî weha li ser milê me ye. Em divê ji bîr nekin ku Necmettîn Büyükkaya û jiyana wî ji bo me û welat û tarîxa me serbilindiyekê ye. Jixwe mebesta wan rêzan jî, bi tenê, vê yekê bîr anîne.

Necmettîn Büyükkaya xurt, jîr û zana bû. Ew her gav, li herî li pêşiya hevalên xwe bû, xwe ji wan ra dikir sîper. Zor û zordariya dijmin çavên wî neditirsandin. Karên giran û bi tehlûke para wî bû. Wi bi xwe ew hildibijirîn. Kurdistana Başûr, hemû Kurdistan, Turkiye, Rojhelata Navin, Ewrûpa û hemû dinya warê wî yê xebatê bû. Ew, bê westan, bi şev û roj, dixebitî.

Ji ber xebatên xwe yên siyasî, ew rastî her celeb merivî dihat û bi hêsanî, bi wan re dan û standineke xweş dianî pê. Wî dikaribû, di rojekê de, serokwezîrkî, serokên çend partiyên siyasî, çend ronakbîr, çend gundî û karker bidîtina û bi şev jî, li ser tixûban, di bin stariya stêrkan de, li nik şivanekî bixeviya. Ew hem xurt, jîr û zane, hem jî nefsbiçûk bû. Wî xwe, her gav, wekî şagirtekî didît. Ne wekî merivekî zane û jixwerazî, lê wekî şagirtekî ku nû dest bi hînbûnê kiriye û her tiştî meraq dike.

Wî defterên biçûk hebûn. Ew defter bûbûn hevalên wî yên herî nêzîk. Her gav wî tiştine dinivisîn û dixistin defterên xwe. Wî ji der û dorên xwe tişt dipirsîn û gava ew rastî tiştekî nû yan ji balkêş dihat, ew lê hûr dibû.

Ew evîndarekî bêhempa bû. Wî ji meriv, dêr û dever, avahî û xweşiyên welatê xwe hez dikirin. Wî ji bajar û gund, meriv, dê û bav, jin û zarokên xwe hez dikirin. Diya wî, ne bi tenê dê, herweha dost û hogira wî bû jî. Ew bi saetan li ber çokên diya xwe rûdinişt û pê re dipeyivî, dibû şirîkê derd û keserên wê. Keça wî Serdil -ji bo wî- payebilindiyeke stûr bû.

Û evîna welêt, evîna azadiyê. Evîna welêt û azadiyê dil, mêjî, can û ruhê wî kiribû weke kozeke agir. Wî dizanîbû azadî çi ye. Wî dizanîbû ka çima azadî ji bo welatê Kurdistanê pêwist e. Loma jî ew ji bo azadiyê dixebitî û li ser riya azadiya welêt şehîd ket.

Di tarîxa 22.11.1979 an de, wî ji min re nameyeke dirêj nivisîbû. Name ji Şamê bû. Vê namê baş nîşan dida ka ew çawan dijiya, rewşa wî çi bû û wî çiqas ji azadiyê hez dikir. Di derekî namê de, wî weha digot: ''Di çûnê de ji ber wê pasaporta nebixêr li ser sînor hatim girtin. Turkan tê derxist. Heta min xwe ji destê wan xelas kiriye şîrê diya min ji difna min hate der. Lê bi saya wan du sed markan wan ez berdam. Min ew du sed mark û du hezar liraê Turkî ruşwet da. Tabiî tê ne gihîştin ku ez xelkê Turkiyê me. Min her digot:

— Ez Îrani û Azerî me...

.....

Her çi derbas bû. Ku ji destê wan rizgar bûm, hîn min dît kurizgarî û der çiqas xweş e. Rast çûm Diyarbekir. Min Dêya Serdilê girte milê xwe û çûm xwe li kolanên Diyarbekir hêl kir. Bi rastî min tu car Diyarbekir ew çend xweşik ne dîtibû!..''

Siûda kirêt û bêbext! Wîçavên xwe li Diyarbekira ku wî evçend jê hez dikir, girtin. Necmettîn Büyükkaya xwediyê xewnên şêrîn û mezin bû. Wî bawerî bi Kurdistana mezin û yekîtiya gelê Kurdistanê anîbû. Tevî ku

Dûmahîk rûpel 17

www.arsivakurdi.org

Kongra Federsyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê ya 7-em

Di rojên 14 û 15-ê sibata 1987-an de kongra Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê ya 7-em bi serfirazî pêkhat. Di kongrê de di gel gelek mêvanan, gelek nunerên rêxistinên swêdî û kurdî beşdar bûn.

Kongre di roja 14-ê sibatê, seet 11.00-an de, piştî tespîtkirina nuneran, bi rawestana ji bo bîranîna şêhîdên Kurdistanê li gel xwendina Ey Reqîb ji alî koroya AKSA ve destpêkir.

Dûre dîwana kongrê; Kerîm Husamî, Îhsan Aksoy, Reşo Zîlan û Hesen Mizgîn bi hemû dengên nuneran hatin hilbijartin. Dîwanê rê da serokê Federasyonê, heval Hanefî Celepli ku axaftina xwe bike. Piştî axaftina serokê Federasyonê, bi dor, wezîrê biyaniyan George Andersson li ser navê Partiya Sosyal Demokratan, serokê Daîra Biyaniyan ya Dewletê Thord Palmlund, parlementê Partiya Muhavezekar (Moderat) Per Olof Strindberg, parlementê Partiya Komûnîst ya Çep (VPK) Oswald Söderqvist, parlementê Partiya Merkezî (Center) Per Granstedt, serokê Ciwanên Komûnîst Stellan Hermansson, nunerê Komîta Piştgirtiya Kurdistanê Elîn Clason yek axaftin kirin û di axaftinên xwe de piştgiriyên xwe bi tevgera rizgarîxwaziya Kurdistanê nîşan dan.

Herweha, Komela Pêşverûyên Turkiyê Li Swêdê (ISTIB), Federasyona Yogûslavî, Federasyona Macarî, Yekîtiya Ciwanên Sosyaldemokrat ya Swêdê (SSU), Yekîtiya Ciwanên Komûnîst ya Swêdê (SKU), Federasyona Li Dij Nijadperestiyê birûskên piştgiriyê şandin kongra Federasyonê.

Ji bilî van mêvanên swêdî û miletên din, ev rêxistinên Kurdistanî di

perçek ji axaftina Serokê Federasyonê, Hanefî Celepli

Mêvanên birûmet û hevalên hêja,

Li ser navê Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê, ez xêr hatina we dikim ji bo Kongra me ya 7-em.

Bi rastî em gelekî şa ne wekî wezîrê biyaniyan George Andersson, serokê Daîra Beyaniyan Thord Palmlund, Parlementerên Partiya Muhavezakar (Moderat) Per-Olof Strindberg, Partiya Nawendî (Center) Per Granstedt û Partiya Çep a Komunist Oswald Soderqwist li ser vexendina me beşdarî Kongra me dibin.

Em beşdariya wan wek piştgirî ji bo tevgera azadixwaziya gelê kurd qebûl dikin.

Mêvanên birûmet û hevalên hêja, ji bo ku zêde wextê we negrim, dixwazim bi kurtî behsa rweşa gelê kurd û welatê me Kurdistanê bikim.

Em kurd netewekî 20 milyonî ne û xwediyê dîrok, çand, ziman û qedereke muşterek in. Herweha bi hezeran salin ku em li ser axakê muşterek jî dijîn. Lê ev axa, Kurdistan ji alî çar dewletan de hatiye parvekirin û ew dewletên dagirker li hember gelê me siyaseteke nemirovî dajon.

Bombekirina bajar û gundên Kurdistanê, zindan, êşkence kirina welatparêzên kurd, êşkenceyên komî di gundan de, surgun kirina gelê kurd jiyana rojîn e li Kurdistanê.

Gelê me di feqîriyeke dijwar de dijî, herçend welatê me yek ji welatên dewlementrîn e li cîhanê. Ji xwe sedemê hemû zilm û teda li ser gelê me dibe ev yeka ye. Hemû petrola ku Iraq û Turkiye bi kar tînin, ya me ye. Welatê me jî alî madenan de, hesin, komir, krom, bakir û hwd. gelekî dewlemend e. Firat û Dîcle, ji kîjanan Turkiye piraniya ihtiyaca xwe ya elektrikê bi dest dixe, li welatê me derdikevin. Axa welatê me gelekî bi xêrûbêr e, gelek ji berhemên çandiniyê baştirînin li cîhanê.

Lê, tu fêde ji van dewlemendiyan nagihe gelê kurd. Ew dewletên dagirker, Turkiye, Iran, Iraq û Suriye, dewlemendiya welatê me didizin. Ji

Foto: Şoreş Zîrek

xwe ji bo vê yekê ye ku ew dixwazin gelê kurd ji holê rakin. Lewra jî wan zimanê me, çanda me, stran û dîlanên me, belê her tiştê me qedexe kirine. Ewî ku dixwaze li kurdîtiya xwe xwedî derkeve, ne xwedî mafê jiyanê ye.

Lewra ye, mêvanên birûmet û hevalên hêja, ku me welatê xwe terk kiriye û mecbûr mane bi hezeran kilometer ji Kurdistana şîrîn dûr bijîn. Ji ber ku em dixwazin li kurdîtiya xwe xwedî derkevin û li welatê xwe di aşîtiyê de bijîn. Em jî dixwazin wek hemû netewên azad mafê çarenûsî xwe têxin destê xwe. Ev yeka mafê meyê bingehîn e. Neteweyên cîhanê yên azad, ev mafên bingehîn bi hevre di peymanan de tesbît kirine. Ew dewletên ku Kurdistanê di nav xwe de perçe kirine jî di bin van peymanên nevnetewî de îmzên xwe avêtine, lê di praktikê de wan peymanan li ber çavên cîhanê dixin bin lingên xwe.

Em gelekî berxwe dikevin ku heta îro tu hukumetekî pirsa kurdî di warên navnetewî de ne aniye rojevê. Li gor dîtina me, Swêd, welatekî ku pêşengiya parastina mafên mirovaniyê dike, dikare vê berpirsiyariyê bide ser milê xwe û rewşa 20 milyon mirovî bine rojeva Koma Netewan. Em bawer in ku hemû rêxistinên siyasî yên Kurdistanê wê ji dil û can piştgiriya vê insiyatîvê bikin.

kongra 7-em de beşdar bûn û slavên piştgiriyê pêşkêşî kongrê kirin: PDK-Îran, PASOK, Berey Yekgirtuy Demokratî Kurdistan, Partiya Demokratik ya Gelî Kurdistan -liqê Ewropa û liqê Swêdê, Komele -liqê Skandînavya, KIP -komîta Swêdê, Ala Rizgarî, K.U.K. -liqê Swêdê, Partiya Pêşêng a Karkerî Kurdistan -liqê Swêdê, Kawa, Komîta Piştgirtina Rêya Şoreş -liqê Swêdê, Yekîtiya Sosyalîsta Kurdistan, Têkoşîn -liqê Swêdê, Partiya Hevgirtina Gelî Kurdistanê li Sûriyê, Partiya Demokratî Kurdî Pêşverû li Suriyê -rêxistina Swêdê, AKSA, KSSE (Berlin) -liqê Swêdê, KSSE (Prag) -liqê Swêdê, Rêkxirawî Xwendkaranî Sosyalîstî Kurd Le Ewropa (SOKSE), Komela Çanda Karkerên Kurdistan (KOÇ-KAK), Komela Gelê Kurdistanê, Komela Kurdistanê Li Başûrê Swêdê, Komela Kurdî Li Eskîlstûna, Komela Kulturî Swêdî-Kurdî, kovara Svensk-Kurdîsk Journal, rojnama Serdema Nû, kovara kurdî a mîzahî Îsot.

Foto: Şoreş Zîrek -

Axaftina wezîrê biyaniyan Georg Andersson.

Wezîrê biyaniyan bi pêşkêşkirina slavên hukumeta Swêdê ji bo kongra Federasyonê dest bi axaftina xwe kir.

Hevalên Hêja,

Ez kêfxweş im ku dikarim di kongra we ya 7-em de ku Federasyona Kurdî pêktîne, beşdar bim.

Ji bo me swêdiyan gelekî tabiiye ku em karibin komele û rexistinan saz bikin, kongre û konferansa pêk bînin û bi awakî azad û demokratîk pirsên xwe munaqaşa bikin.

Lê li her derê cîhanê ne weha ye. Ew multeciyên ku li welatê me dijîn, şahîdê vê yekê ne. Gelek ji van multeciyan kurd in û gelek ji wan jî îro li vira civiyane.

Hukumeta Swêdê gelek caran diyar kiriye ku ew bi xemekî giran raporên di derheqê zordestiyên ku li ser kurdan tên kirin, taqîb dike.

Ji bo Swêdê bi cîanîna mafên mirovanî gelekî muhîm e. Bi taybetî jî ji bo eqaliyetên etnîkî.

Vatiniyeke navnetewiyê girîng ev e, ku ji bo ku li hemû welatan şertên weha pêk bên ku eqaliyetên etnîkî di azadiyê de bijîn, ji pêşdeçûna aboriyê para xwe bistînin û herweha li kultura xwe xwedî derkevin û zimanê xwe pêşde bibin, bê karkirin.

Ji şerê cîhanê ya duem û bi vir de, Swêd bûye welatekî biyaniyan. Mirov ji welatên din hatine Swêdê, ji bo ku bibin xwediyê karekî an jî ji ber zilm û tedayê reviyane. Wana gelek xebatên hêja kirin ji bo pêşdeçûna jiyaneke baş li welatê me.

Divê politîka me ya biyanî, wekhevî, azadiya hêbijartinê û hevkarî bi xurtî bête parastin. Ev armancên ku bingeha politîka me ya biyanî ye, meclîsa me formule kiriye û hemû dîtinên siyasî pê radibin.

Ewên ku li vî welatî dijîn û kar dikin, bi hev re berpirsiyarê civatê ne û xwediyê biryarên di derheqê pêşveçûna civatê de ne. Ev yeka bingeha tevjiyînê ye.

Mafê biyaniyan jî heye ku tevî kar û barê civatê bibin, tesîrê li rewşa taxên xwe, belediyên xwe û wîlayetên xwe bikin.

Herçend biyanî ne hevwelatiyên swêdî ne jî, lê piştî sê salan li Swêdê xwedî mafê dengdanê ne di bijartina belediyan de. Pirsa mafê dengdana di hilbijartina meclîsê de jî hîn halnebûye. Lê ji bo ku meriv bixwaze û karibe mafê xwediyê dengdanê bi kar bîne, divê meriv pêbihese ku maneke mafê dengdanê û herweha tesîreke wê heye.

Tunebûna karekî ji bo herkesî, kêmbûna xaniyan û tirs û şîdeta li cîhanê, mixabin herweha li vir jî, dibe sedemê ku gelek kes ji bo pêşerojê bi tirs û sawiran dihêsin. Di rewşên weha de pir caran li gunehkaran tên gerîn... û biyanî û milteci dibin gunehkarên rewşên zehmet. Di rewşên weha de nijadperestî û dijminatiya biyaniyan pêşde diçe.

Ez tirs û şika ku kurdên li welatê me ketine baş fam dikim. Şubheyên li dij şexisan -bi bingeh an bê bingeh- tu cara nikare bibe sedemê ku xelkek di bin tohmetê de bimînе. Divê em bi hemû qewetê xwe li dij tevgerên weha nijadperestî bisekinin.

Qiymetê hemû însanan wekheve. Her mirovek xwediyê tiştekiye ku bide tevjiyana mirovî. Têkiliyên bi kulturên nû, di fikirkirina me de teşwîqeke û di kultura me de nuafirandinek e.

Naskirina mirovan ji welatên din bi tecrube û fikrên din, tiştekî hêjaye. Jiyana bi gelên din re ne tehlukeyek e, lê îmkaniyetek e.

Çend hefte berî îro, me bi nunerên rêxistinên civakî re civînek çêkir û me li ser hevkarî û dostaniya bi multeciyan re munaqeşe kir. Em gihan wê baweriyê ku em li biharê hefteke dostaniyê pêkbînin.

Ji bo ku em karibin jehra ku di forma dijminatiya biyaniyan de pêş de tê, bidin sekinandin, lazime em alîkariyê bidin mirovan ku nêzîktirê hev bin. Lewra jî heviya min ew e ku hemû rêxistinên swêdî yên gelerî û rêxistinên biyanî wê di hefta dostaniyê de bi aktîvî beşdar bin.

Û ez li vir Federasyona Kurdî û hemû komelên kurdî dawetî tevîbûna hefta dostaniyê dikim.

Spas ji bo ku we ez dawetî kongra xwe kirim û pêşketina kongra we dixwazim. Ez hevî dikim ku kongra we wê bibe mîsaleke pêşketî ku hûn maf û azadiyên demokratîk bi kar tînin. Ku hûn jî wekî herkesî li Swêdê serbest dikarin bixebitin.

Ji dervayê Swêdê jî nunerên Enstîtuya Kurdî ya Parîsê û Akademiya Kurdî li Elmanya Rojava di kongra Federasyonê de beşdar bûn.

Herweha ji ev rêxistinên kurdî jî pîrozname ji kongra Federasyonê re hatin: Tevgera Sosyalîst a Kurdistanê -liqê Swêdê, Navendiya Kurdistan Arnhem -Holanda, Tekoşer -Belçîqa, Komela Kurdên Awistraliya û Yekîtiya Xwendekar û Lawên Kurdistan li Ewropa.

Ji mamoste Osman Sebrî û Îsmet Şerîf Vanli jî pîrozname ji bo kongra Federasyonê hatin.

Piştî axaftina mêvanan û xwendina pîroznameyan, rojeva kongrê hate qebûl kirin, li ser muracata çar komeleyên kurdî ji bo endambûna di Federasyonê de hate sekinîn û endameti-ya komelan: Komela Kurd Li Sundsavalê, Komela Kulturî Kurdistan Li Göteborg, Komela Kurd li Hudiksvalê û Komela Kurd Li Huddinge hate qebûl kirin. Bi vê awayî jimara komelên endamên Federasyonê gihan 13-an.

Xala di dawiya roja 14-ê sibatê de, xwendina raporan û rûspîkirina wan bû. Rapora xebatê, ya malî û ya komîta çavdêr hatin xwendin û bi dengê hemû nuneran hatin rûspîkirin. Bi vê awayî dawiya roja yekemîn hat.

Roja duemîn bi munaqaşa destûrê destpêkir. Li ser pêşniyarên komîta destûrê û pêşniyarên nuneran hinek xalên destûrê hate guhartin û muhîmtirîn guhartin ew bû ku organeke Federasyonê nû, Komîta Gîştî kete destûrê. Piştî ku xala destûrê dawî hat, li ser pêşniyaran biryar hatin girtin.

Di dawiya xalên rojevê de jî bi awakî demokratîk û bi îradeyekî azad organên nû ji bo kar û barê Federasyonê hatin hilbijartin

Bi xwendina Ey Reqîb dawiya kongra Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê bi serfirazî dawî hat.

Kongra 7-em, demokratîk- û xurtbûna Federasyonê pir vekirî nîşan da. Berî her tiştî Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê rêxistineke demokratîke kurdên li Swêdê ye. Vatiniyên Federasyonê ev in, ku kurdên li Swêdê ku ji herçar perçên Kurdistanê ji ber zor û zulmê ji Kurdistanê dûr ketine û hatine Swêdê, di bin baskên xwe de bicivîne; ji bo zarok,


Foto: Şoreş Zîrek

Thord Palmlund

(Serokê Daîra Muhaciran)

Spekulasyonên ku bi munasebetê kuştina Olof Palme hatin kirin, tu cara li ser dîtina me ya li ser pirsa kurdî û multeciyên kurd tesîr nekir. Kurdên ku ji ber zor û zulmê hatine welatê me, bi xêr hatine.

Federasyona we bi karûbarên hêja ji bo kurdên li Swêdê radibe. Ji bo ciwan û multeciyên kurdan xebatên teybetî kiriye. Ez serketina kongra we û serketinê di karûbarên we yên pêşerojê dixwazim.

Oswld Söderqvist (VPK)

Ez ji salên 60-î û bi vir de bi pirsa kurdî ve mijûl bûme û ew nasîne.

Careke din ez bala hukumata Swêdê li ser rewşa multeciyên kurd dikşînim. Rewşa gelê kurd bi rastî rewşeke taybeytiye

Divê karûbarê Federasyona Kurdî yên serketî berdewam bin. Hêvî dikim ku emê rojekî bikaribin biçin Kurdistaneke azad.

Axaftina Stellan Hermansson

(Serokê ciwanên komunîstên Swêd)

Berî her tiştî ez li ser navê ciwanên komunîst sipasiya xwe pêşkeşî we dikim ku we em vexwendin kongra xwe.

Li her derê Swêdê pêywendiya me û kurdan heye. Em di karûbarên siyasî, tevgerên piştgirî û hefleyên swêdî û kurdan de, bi hev re bûne. Bi alîkariya van xebatan me firsendê dîtiye ku gelê kurd ji nêzîk ve nas bikin. Û em wan weke gelekî comerd, mirovperwer û xwedî kultureke dewlemend dibînin.

Lewra em bi her awayî gelek aciz dibin ku di van demên dawiyê de li welatê me, kurd di bin tometa huqûqî de mane.

Ez ji swêdî bûna xwe şerm dikim ku xistina gelê we di bin tomeke wisa li welatê me dikare çêbe. Swêd li hember we deyndar e.


Foto: Şoreş Zîrek

Per Olof Strindberg (M)

Ez gelekî şa me ku serokatiya Partiya Moderat vatinî da min ku ez daxwazên partiya me yên serfiraziyê li vir pêşkêşî we bikim.

Li ku dibe bira bibe, em hemû formên tedayan li ser eqaliyetên etnîkî û kulturî mahkum dikin.

Rewşa kurdan her wext û li her welatê ne wek hev e. Îmkaniyata ku pirsa kurdî li Koma Netewan di komîsyona mafên mirovaniyê de têkeve rojevê, ji alî meclîsa Swêdê û yên welatên din hatiye munaqeşe kirin. Komîta Meclîsa Swêdê ya Dervayê Welêt -di kîjanê de ez jî endam im, bi hemfikriyeke mezin diyar kir wekî pêwîste ku em bîrûraya navnetewî li ser zor û zulma ku li kurdan dibe, bi bîr bînin.

www.arsivakurdi.org

ciwan, jin û multeciyên kurdan xebatên taybetî bike; ji bo pêşdebirina ziman-edebyat û çanda kurdî bixebite. Herweha Federasyon peçeke tevgera azadiya Kurdistanê ye; bîrûraya gištî ya Swêdê di derbarê pirsa Kurdistanê de agahdar dike û piştgiriya wan ji bo tevgera azadiyê digre.

Îro di Federasyonê de 13 komelên Kurdistanî endamin. (Van rojên dawî ji şeş komelên nû jî daxwaza endametiyê hat.) Her komelek di bajareke Swêdê de dixebite. Di her komeleyê de jî kurdên welatparêz ji herçar perçên Kurdistanê endamin.

Ji îro pêve divê em li Federasyonê xwedî derkevin û merhala ku Federasyon gihaye pêş de bibin.

Per Gransted (C)

Gelekî spas dikim û pir şa me ku ez di nav we da me. Min silavên serokê partiya me Olof Johansson jî ji we re aniye.

Biyanî bûn pir zehmet e. Biyanî bûn ev e, ku mirov ji ber sedemên siyasî, aborî û civakî ji welatê xwe dûr ketine. Ev yeka bi xwe re hin zehmetiyan dijwar jî aniye. Lê belê divê em li dij van zehmetiyan bi hev re kar bikin. Nemaze hûn kurd di vê dawiyê de ketin rewşeke zehmet. Her çend li ser sê-çar kesan tenê şik hatiye kirin jî, lê belê em dizanin ku neheqiyeke mezin li we bûye.

Em tev de berpirsyarin ku dostaniyê pêşde bibin. Divê em bi hevre Swêdeke herkesî biafrînin.

Biryarên Kongrê

Biryarji bo Aştiyê

Di van salên dawi de dinya me, diwarê şerê atomî û xwe biçekkirinê de dewrekî gelek xirab û bi tahlûke derbas dibe.

Emerîka Yekbûyî di vî warî de li dij opînyona aşîtîxwazên dinê rolê xwe yê êrîşger berdewam dike. Bi cihkirina raketên atomî li gelek welatên Ewrûpî û bi taybetî xwestina destpêkirina Şerê Stêrkan (SDI) dixwaze xebata ji bo aştiya dinê ji holê rake.

Emerîka Yekbûyî disa li civînên navnatewî ser van pirsan xwestina danûstandinekî pozîtîv nîşan nade, xwestinên xwe yê êrîşker û şerxwaz dixwaze li ser welatên din jî ferz bike. Rêxistinên Nato ku bi her awayî di bin kontrola Emerîka Yekbûyî de ye, li ser welatên ku endamê NATO-yê ne, xwestinên xwe bi hêsanî dikare bîne cî û bi herawayî tesîra xwe li wan welatan ferz bike.

Hukumeta Reagan bi siyaseta xwe ya êrîşger ku eşkere ji aliyê wan ve tê parastin, peymanên kevn ku navbera Yekîtiya Sovyet û Emrîka Yekbûyî hatibû qebûlkirinê, digre bin lingan, yekalî dixwaze xwe ji berpirsiyariyên van peymanan xilas bike. Peymana SALT 2 bi vî awayî ji aliyê Emerîka Yekbûyî yekalî hat xirabkirinê. Hevdîtina Reykawîk û Cenewre dîsa dîsa bi destê îdara Reagan negiha cihekî.

Emerîka Yekbûyî wekî din jî, tu caran guh nade înîsiyatîfên Yekîtiya Sovyet û xwestina wan î aşîtîxwaz.

Ji 1,5 sal zêdetir e, ku Yekîtiya Sovyet bi yekalî ceribandinên xwe yên atomî daye sekinandin. Armanca wan ew bû ku, bi vî awayî zor bidin ku Emerîka Yekbûyî jî di vî warî de qeraran bistîne. Lê heta berê vê 2 hefteyan jî Emerîka Yekbûyî ceribandina bombeyên atomî ya xwe bi cîh anî. Emerîka Yekbûyî piştî qirara Yekîtîya Sovyet heta îro nêzîkê 25 caran caran ceribandinên wisa pêk aniye.

Têkoşîna ji bo aşîtiyê li dinê ji têkoşîna me ya ji bo xilasbûna gelê Kurdistanê cihê nîne. Ji nêzîk ve gelek girêdayiyê hevûdû ye.

Kongra me daxwaz û piştgiriya xwe ji bo tekoşîna aştiyê li dinê diyar dike.

Ji Daira Biyaniyan re

Piştî sala 1980-an li ser hatina rejîma leşkerî li Tirkiyê û destpêkirina şerê navbera Iran û Iraqê rewşa gelê kurd li van welatan xirabtir bû. Teda, zordestî, girtin û qetlkirina welatperwerên kurd roj bi roj zêdetir bû. Gelek kesên azadîxwaz yan hatin girtin yan jî di şertên zor û dijwar de xwe avêtin dervayê welêt. Ji van kesan hinek jî piştî van bûyeran hatin Swêdê û wek multeciyên kurd xwestin li vî welatî bicîbin.

Tewra Daira Biyaniyan û ya hukumeta Swêdê di destpêkêde baş bû. Multeciyên xurd bê dijwariyên mezin li Swêdê îqama rûniştinê distendin. Lê piştî 1983-an vê de di tewra wan de guhertineke nebaş xuyakir. Muamela li hember multeciyên kurd roj bi roj xirabtir bû. Federasyona me li dij vê yekê hîn jî xebata xwe dxdomîne.

Xwestina me ji SIV ew e, ku muamela li gel multeciyên kurd divê ji muamelên li gel multeciyên welatên din cihêtir nebe û mafê multeciyê weka ku di qanûnên Swêdê ya multedciyan de dinivîsîne, ku ew heq di destûra Yekîtiya Netewan de jî baş hatiye kifşkirinê, li gor wiya bimeşe.

Gava SIV pirsên multeciyên kurd digre destê xwe û qerarên dawî dide, divê rewşa gelê kurd bi awakî tevayî û zordestiyê li ser gelê kurd tu car neyê ji bîrkirinê.

SIV divê, li ser pirsên multeciyên kurd û li ser ewraqên wan dev ji hevkariyê ku heta îro carnan bi sefaret yan jî meqamên dewletî ya Tirkiyê û dewletên din, berde. Di vî warî de li gora qanûnên xwe û qanûnên navnetewan ku ji aliyê Yekitiya Netewan de hatiye tesbît kirin, gav bavêje.

SIV divê, xwestin û daxwazên Federasyonê û Komîsyona Multeciyan, bigre cidiyê û wan di van pirsan de weke referens, girîngtirîn rêxistin qebûl bike.

Kongra me li ser vî pirsî, van xwestin û daxwazan weke qirarê Kongrê qebûl dike û hewl dide ku Komîta Karger ji bo dewra pêşîn de li ser van pirsan bisekine.

www.alanakurd.org

Biryarên Kongrê

Ji Yekitiya Netewan, Komîsyona Mafên Miroviyê re

Îro li Kurdistanê nêzîkî 20 milyon kurd di çar dewletan de perçekirî û dibin zor û stemê de dijî.

Turkiye, ku Bakura Kurdistanê û perça herî mezin xistiye bindestê xwe, zordestiyeke dijwar li ser gelê kurd dajo. Tu mafê mirovî ji dagirkerên tirka nayê qebûl kirin. Hetta kelîma kurd jî hatiye qedexe kirin. Rejîma tirk a nîjadperest, bi înkar, asîmîlasyon û zordestiyê dixwaze hebûna gelê kurd ji ortê rake.

Rejîma olperestiya Îranê jî mafê gelê kurd ê 5 milyonî li Kurdistana Îranê qebûl nake, bi êrîşên hov dixwaze serî li gelê kurd bide xwarkirin. Li Kurdistana Îraqê şerê gelê kurd a çekdarî gelek ji kevn de berdewam e. Rejîma Îraqê hebûna gelê kurd înkar nake. Li Kurdistana Îraqê li dora 3 milyon kurd heta sinoreke xwedî mafên xwe yên kulturî bûn. Lê daxwaza gelê kurd ji bo otonomiyê tu car bi cîh nehat. Piştî 1975 ji mafên kulturî yên heyî hêdî hêdî ji dest tên girtin, kurd ji welatê xwe tên cîwar kirin û bi ereb tê bicih kirin.

Li Kurdistana Suriyê jî li dora milyoneke kurd dijî. Her çiqas li ser kurdan zordestiyeke dijwar tunebe jî, mafê gelê kurd a netewî û demokratîk tuneye.

Divê Yekîtiya Netewan prensîbên xwe ji bo gelê kurd jî têxe jiyanê û bi xurtî bixebite, ku di welatê xwe de bibe xwedî biryar, qedera xwe bi xwe tayin bike. Kurdistan ji leşkerên dagirkeran bê xelas kirin ku kurd jî xwedî jiyaneke mirovî bin.

Em hêvîdar in û daxwazî ji we dikin, ku Yekîtiya Netewan li ser pirsa kurdan bisekine û ji bo bicîhanîna prensîbên Yekîtiya Netewan bixebite û pirsa kurdan bike rojeva xwe.

Bi serketina we

Kongra Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê ya 7-em
Stockholm, 15.2.1987

Ji hukumeta Swêdê re

Çawa ji aliyê we jî tê zanîn, ku tu mafê gelê kurd a netewî û demokratik tune ye. Gelê kurd di nav çar dewletan de perçekirî û di bin zordestiyeke dijwar de dijî.

Diyare ku armanca Yekîtiya Netewan a herî giring li dij zulm û zordestiyê rawestan e. Yekîtiya Netewan diyar kiri ye, ku divê her gel bi serbestî biryarê li ser jiyan û pêşenda xwe be, tu zor û zilm ji bo dagirtinekî welatekî dî pêk neyê.

Gelê kurd yek ji wan gelan e, ku bi sed salan di bin nîrên zordestan de dijî û Kurdistan bi zorê hatiye îşgal û perçe kirin. Lê çi mixabin pirsa gelê kurd di Yekîtiya Netewan de nayê rojevê û dewletek pêşengiyê ji bo pirsa gelê kurd nake.

Swêd yek ji wan welatên azadî û serbestîxwaz e û ciyekî bi rûmet di vê babetê de çêkiriye ku piştgirê gelên azadîxwaz e. Em hêvîdar in û daxwaz dikin ku hukumeta Swêdê wezîfa xwe ya mirovî pêk bîne û pirsa gelê kurd bibe Yekîtiya Netewan û ji bo mafên gelê kurd a netewî û demokratîk pêşengiyê bike.

Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê
Stockholm, 15.02.1987

Newroz bi giştî hate pîroz kirin

Cejna neteweyê kurd Newroz îsal li Swêdê bi giştî hate pîroz kirin. Di roja 22-ê Adarê de Federasyonê cejna Newrozê li Stokholmê pîroz kir. Herweha li bajarên Swêdê yên dinê, Göteborg, Uppsala, Sundsvall, Söderhamn, Bollnäs, Eskilstuna, Jönköping, Karlskoga û yên mayîn, cejna Newrozê ji alî komelên endamê Federasyonê û komalên kurd yên dinê bi şahiyeke mezin hate pîrozkirinê.

Di vê hejmarê de em Newroza xwendevanên xwe pîroz dikin û serketina wan dixwazin. Di jimara hêtê de emê bi firehî behsa pîrozkirina cejna Newrozê li Swêdê bikin.

Foto: Şoreş Zîrek

www.arsivakurd.org

Yekîtiya xortên kurd divê

Wexta meriv li dîroka milletê kurd mêze dike, di her demên dîrokê de xortên kurd di tekoşîna netewî de ciyê xwe girtine û ketine nav şer. Ji destpêka 1900-î de heya îro xortên kurd berpirsiyariya xwe li gor rewş u zirûfê xwe aniye cîh. Bi rastî jî xort di her wextê de, xwînmijî, zulm û zordestiya kolonyalîstan dibînin û hemberî wana rabûne. Bixwe ez jî ji Kurdistana bakur im û demên 1976-1980 baş tê bîra min. Li welatê me xortên kurd rêxistinên xwe avakiribûn, ew rêxistin jî di şerê demokratî û azadiyê de tekoşînekî bêhempa didan, numune pir in wek DDKD, DHKD, ASK-DER, HALK-DER û yên din. Di şiyarkirina gundî û xebatkaran de tesîra wan rêxistinan gelekî giring bû. Çi bi kovaran û çi bi mitîng û bi belevokan fikrê netewî û çandî li her aliyê welat belav kirin. Li gor baweriya min xortê kurd iro jî di bin zulm û zordariyê de têkoşîna xwe didomîne.

Xort û biyanîtî

Îro tiştekî li ber çava ye ku piştî hatina cuntaya faşîst, şertên xebatên şoreşger û demokratan li Turkiyê dijwar bû. Ji ber vê yêkê qismek ji wana derketin derveyî welêt. Her viha ji perçeyên din jî gelek malbatên kurd barkirin û hatin welatên Ewrupayê. Li gor baweriya min di welatên Ewrupayê de di şertên biyanîtiyê de vatiniyên xortên kurd hîn jî pêwistiya xwe diparêze. Her çiqas di navbera xebata li welêt û xebata li dervî welêt ferq hebe jî, lê nayê wê manê ku xortên kurd ji têkoşîna milletê xwe dûr bikevin û birevin. Di şertên biyanîtiyê de xortên kurd dikarin bixebitin û alikariya gelê xwe bikin. Îro em baş dizanin ku bi hezaran xortên kurd li çiyan de çek di dest de dijî kolonyalîstan şer dikin. Herçî em xortên kurd yên ku li Ewrupayê dijîn, dikarin alikariya birayên xwe yên li çiyan bikin. Bi baweriya min xortên kurd li Ewrupayê dikarin du vatiniyên giring bicîbînin: Ya yekem, di derheqê têkoşîna milletê kurd de agahdarî belav bike û alîkariyê ji bo têkoşîna li welêt berhevbike. Ya duemîn, xortên kurd divê li Ewrupayê sinet û çanda xwe, ziman û folklora xwe ji bîr neke û di mercên îro de wan bi pêş xîne. Herweha divê xortên kurd xwe ji tiştên ne baş biparêzin. Em dizanin ku li welatên Ewrupî de riya sernexweşinê vekiriye û qada vî tiştê pir e. (Narkotîzm, alkolîzm, bê berpirsiyarî).

Dema em vegerin destpêka avakirina Federasyona Komelên Kurd li Swêdê, emê bibînin ku hevalên wê rojê xebatekî gelek baş û fireh danîbûn ber xwe û ji wê xebatê gelek tişt bi cîh anîbûn. Di demeke kurt de Federasyon di herbeşê civata kurd de rêxistinên xwe çêkir (wek komela jinan, wek Kurdistanspor û gurûba tiyatroyê). Lê mixabin di wan salên dawîn de, Federasyonê gavên xwe yên pêşî ne domand û her bi şûnde diçû, têkiliyên wê bi civatê re sist û qels dibû. Lê îro em dibînin ku Federasyona me dixwaze li Swêdê têkiliya xwe bi xortên kurdan ve xurt bike. Divê daxwaza me xortan jî ev be ku em jî tevkarî û pêwendiyên xwe bi Federasyonê re xurtir bikin. Herwiha emê bikaribin bi rêkûpêk organîze bikin û vatiniyên xwe bi cîh bînin. Îro di bin baskê Federasyonê de seksiyonekî xortan hatiye damezrandin. Ez bi xwe jî serokê seksiyona xorta me. Sekiyona me ji bo tanzîmkirina xortên kurd wek armancekî daniye ber xwe. Eger hevalên me jî alikariya me bikin, bê guman emê di demekî kurt de gavên hêja bavêjin. Nuha Seksiyona me gurubeke voleybolê saz kiriye û kursa sazê vekiriye. Di programa me de avakirina gurubeke folklor û basketbol jî heye. Em hêvî dikin ku emê di demeke nêzik de van tiştan jî bi cîh bînin. Seksiyona xortan di kar û xebata xwe de li ser bingehekî demokratî dimeşe. Di xebata xwe de Seksiyona me serbixwe ye û em bi hêzên politikî ve ne giredayî ne. Deriyê seksiyona me ji hemû xortên kurdan re vekirî ye, hevalên ku bixwazin dikarin di xebata me de beşdar bibin, bi Seksiyona me re têkîliyê daynin. Belê iro em ne bi hêzin, lê baweriya me heye ku em destê xwe bi hevdin, emê karibin rewşa xwe geştir û nayê kurd biluntir bikin.

Bi navê serokê Seksiyona Xortan
Hewar

Dûmahîka rûpel 11

rewşa welêt û Rojhelata Navînne baş bû, ew bi behnfirehî, ji bo armancênxwe dixebitî. Wî pir dil dikir ku beşên Kurdistanê û welatparêz û şoreşgerên beşên Kurdistanê hevûdu binasin û bi hev re bixebitin. Di vî warî de, wî xebatên pir hêja kirin. Ew bû "Kak Salahî xwe man, Kak Salahî zîrek û çalak..."

Ew dimilî bû. Lê ji bo wî yekîtiya gel esas bû. Wî hewl dida ku komên civata Kurdistanê nêzîkî li hev bikin. Wî ji dimilyan re digot ku Dimilî divê bi şik li kumancan nenihêrin. Wî ji kurmancan re digot ku Kurdmanc divê dimiliyan ji bîr nekin. Wî ji Soranan re digot ku Soran divê Kurmancan nizm û biçûk nebînin. Bê guman, zehmetî û dijwarî pir bûn. lê ew bi bîhnfirehî dixebitî. Ji ber ku wî hay ji lîstikên dijmin hebû. Wî ferq nedixistin navbera beşên Kurdistanê û komen civatê.

Gava şoreşê li Kurdistana Îranê dest pê kir û gelê Kurdistana Îranê çek hilda, wî xwe gihand wê derê. wî dixwest şoreşa Kurd bibîne, bi agirên şoreşê bisote û ji dersên şoreşê destkewtî be.

Carina wî ji min re name dinivîsîn. Nameyên dirêj, 10-15-20 rûpel. Her nameke wî ji derekî dihat. Rojekê jî nameyek ji Mehabadê hat. Tarîxa namê 22.2.1979 bû. Şoreşa Kurdistana Îranê hê nû geş dibû. Ew, Necmettîn Büyükkaya li wê derê bû. Nama wî ya ku bi tirkî hatibû nivisîn, weha dest pê dikir:

"Birayê min ê hêja,

Ez vê namê ji te re, ji Kurdistana Îranê, ji Mehabadê dinivîsim. min îroj bi Ganî Bilûryan re sohbet kir. Ew bi salan li girtîxanan riziya. Sibê jî Partî Demokratî Kurdistana Îranê derdikeve resmiyetê û ew dê vê yekê bi numayişeke çekdar pîroz bikin. Li Mehabadê. Ji her aliyên Kurdistanê, kurd qefle bi qefle tên... Sibê, bi hezaran kurd dê bi awakî çekdar bimeşin. Partî derdikeve legalîtê. Çav diçirûsîn. Hemû Mehabad, hemû Kurdistana Îranê diherike Mehabadê. Bi rastî, ez jî, bi heyecan, li heviya sibê me..."

Belê me mêrxasekî weha winda kir. Zordar û tawanbarên welatê me tawaneke nû li tawanên xwe zêde kirin û Necmettîn Büyükkaya kuştin.

Em mêrxasê welêt ji bîr nekin.

Em mêrxasên welêt ji bîr nekin.

BERBANGA ZAROKAN

Nerehetiyên biçûk li hev dicivin nexweşiyên mezin çêdikin

Nivîskar: Yilmaz Güney
Wergêr: Temo Zêrîn

Kurik got:
''Ez naçim ser doktor.''
Bavo pirsî:
''Çima?''
Kurik got:
''Ez ji derziyê ditirsim.''
Diya wî jê hêrs bû û got:
''Ku tu ji derziyê bitirsî, tu ji nexweşiyê jî nafilitî...''
Kurik li diya xwe vegerand û got:
''Ez naçim ser doktor.''
Bavo gotê:
''Binêre kurê min î delal! Baş guh bide ser min! Tu nexweş î. Ji bo ku tu ji nexweşiyê xilas bibî, divê doktor li te binêre, di nexweşiya te derxe. Divê rê bide ber me, dermanê te binivîsîne.''
Kurik got:
''Ez derman naxwim; derman tehl e.''
Dê got:
''Vêga bimire!''
Bavo gotina xwe domand:
''Kurê min, hin meriv hene; merivên dêwendam in. Ew jî ji serîlêdana doktor ditirsin. Nola te. Ew di nexweşiya xwe derdixin, lê bi tirs in ku doktor navê nexweşiya wan bibêje. Tevî nexweşiyê jiyan wan natirsîne, ji navê nexweşiyê, ji pêhesîna navê nexweşiyên xwe ditirsin. Lê kurê min, tirsa me divê ne ji doktor, derzî, tehliya derman an jî navê nexweşiyê be, divê ji nexweşiyê bi xwe be. Eger em bi nexweşiyê nizanibin, wê nexweşî me bixwe teva bike. Lê eger em pê bizani bin, em ê wê bixwin, biqedînin.''
Kurik li bavê xwe vegerand:
''Ez nikarim nexweşiyê bixwim, teva bikim.''
Bav keniya, got:
''Em ê zora nexweşiyê bibin.''
Kurik got:
''Ez derman naxwim. Ez derziyê jî naxwazim û naxwazim zora nexweşiyê jî bibim.''
Bavo destê xwe bir ser eniya kurik û got:
''Tu di nav agir de yî.''
Kurik got:
''Ez derman naxwim.''
Dê banî wî kir û got:
''Ziqûm bixwe!''
Bavo got:
''Binêre kurê min î rindik. Serhişkiyê meke. Serhişkî tiştekî ne baş e. Ku em neçin ser doktor, wê nexweşiya te zêde bibe. Ku em bo rêlêgirtinê bi derengî bikevin, tu dê bimrî. Aniha dibe ko ev nexweşiya bêxeter xuya bike, lê her tiştê mezin di destpêka xwe de piçûk e, ew her ku diçe mezin û geş dibe. Eger avzêmkên piçûk nebin rûbar, çemên mezin çênabin û çemên mezin jî nebin, dê deryayên mezin jî derneyên...Zarokên piçûk gir dibin , ji wan merivên mezin dertên.. Nerehetiyên piçûk li ser hev dicivin, nexweşiyên mezin peyda dikin... derewên piçûk kom dibin ser hev, rê didin derewên mezin... Çewtiyên piçûk digihên hev, çewtiyên mezin derdixin...''
''Ez naçim ser doktor. Ez alûçe dixwazim.''
''Kurê min, vê zivistana ha û alûçe''
Diya wî got:
''Ku tu herî ser doktor, em ê ji te re alûçan bikirin.''
Kurik got:
''Ez alûçan jî naxwazim.. naçim ser doktor jî...''
Bavo got:
''Kurê min, êş bi derzî û derman derbas dibin. Ku em êşa kêlîkekê nedin berçavê xwe, em ê ji bin êşên domdar neyên der. Divê em mêrxas bin... ji derziyê tirsîn, digel nexweşiyê hevalbendîtî ye. Ji derman tirsîn alîgirê nexweşiyê bûyin e. Ger em ji derzîlixwexistinê nerevin, em ê zora tirsê bibin. Çi çax ku me zora tirsê bir, wêga em zora nexweşiyê dibin... De ka bêje kurê min î fodil, tu hevalbendê xwe yî an yê nexweşiyê?''
Kurik got:
''Ez hevalbendê alûçê me''
Bêhna Dê teng bû. Got:
''Sûc, sûcê te ye.. Tu rû didî kurik.. Ji dêvla ku tu lûbe-lûb dikî, rake hembêza xwe, em wî bibin. Ku bigrî bila bigrî...''
Kurik dest bi girî kir û got:
''Ez naçim ser doktor.''
Bavo got:
''Hiş megrî. Guh bide ser min. Tu lawikekî piçûk î. Ez û diya te em mezin in. Ku em bixwazin, em dikarin bi herdu çeplên te bigrin û bibin ser doktor. Qeweta te nagihê ku tu li ber xwe bidî. Her tiştê ku bi kêrî te tê, bi zorê bi te kirin, ne xweş e, ma ne wilo ye? Daxwaza min ew e ku tu bi me bawer bî... Bi fêda çûyîna ser doktor baweriya xwe bînî û dil bikî ku em bi hev re herin ser doktor.''
Kurik got:
''Ez naçim''
Bavo ji kena xwe ne girt.
Kurik got:
''Tu çima dikenî?''
Bavo lê vegerand û got:
''Hin meriv hene, nola ku tu ji doktor ditirsî, ew jî wekî te ji şoreşê ditirsin... ji belengazî, tade û zulmê kûr kûr dinalin, dîsan jî ji şoreşa ku dê wan rizgar bike, ditirsin... Ez bi vê yekê dikenim.''
Kurik got:
''Şoreş çi ye?''
Bavo piçekî da aqilê xwe û fikirî.
''Eger ez bikaribimbaweriya te bi ji doktor netirsînê bînim, eger ez bikaribim heq ji birina te ya ser doktor bêm, ev ji bo te şoreş e.''
Kurik bi dengekî bilind dest bi girî kir û digot:
''Ez şorşê naxwazim... ez alûçan dixwazim...''

www.arsivakurdi.org

ئاوڕی دایەوە، هەموو بێدەنگ بووین. پاشان ئەو شاگردەی تەنیشتم بووە موتەرجیم لە نێوان من و ئەفندیدا. دیاکەوت کە مامۆستا (دوای دەمێک زانیم کە بەو کەسانە دەبێژن مامۆستا) ناو و تەمەن و شتی تری پرسیبوو.

ئەو چەند سەعاتەی کە لە قوتابخانە بردبوومە سەر، لێم بیونە چەند سالێک. پترکەوتمە بیرکردنەوەی گوندی و بیری دایک و هەڤال و هاوتەمەنی خۆم نرد.... روحم لە شار و خەڵکی شار چوو، من بەدڵ شکاوی بگەڕێمە وە ماڵەوە، من زانیم کە باوکم بۆ جاری یەکەم بوو منی هەڵ خەڵەتاندوە... گەیشتم و نەگەیشتمە ماڵەوە، روم کردە باوکم (ئەودەم لە شار بووا و لێم پرسی:

کوا حیکایەت خوان و گۆرانی بێژی تۆ؟ بۆ بە زمانی ئێمە قسە ناکەن؟

باوکم هەستی کرد، من بەو قسانە پتر رۆیشتم، بەڵام ئەوخۆی نەشڵەژاند و لێی نەخوڕیمەوە. بەسەر خۆیدا نەهێنا، بە پێچەوانە، بە دەنگێکی نەرم، نەک وەک هەر جاران لە حاڵەتی وادا لەگەڵم دەپەیڤی: کوڕم تۆ بچوکی، زۆری پێ ناچێ کە هەموو شت تێ بگەی، چیرۆکیشتان بۆ دەگێڕنەوە، بەڵام لەسەر زمان؛ دەبێ تۆبزانی، زمانی مە هی ماڵێیە، زمانی تریش هی قوتابخانەیە، باوکم دەستی خستە سەرشانم لە قسەکانی بەردە وام بوو: کوڕێ من، من باوەڕم بە تۆ دێ، ماشالاّ تۆ وشیاری، زۆری پێ ناچێ کە تۆ وەک بولبول بە زمانی حکومەت قسە دەکەی.

من لە باوکم نەپرسی بۆ زمانی مە هی ماڵێیە، ئەوی تر هی قوتابخانەیە، لەوێدا لە ماڵی مەدا، قسەی گەوران یەک بوو نەدەبووە دوو، هەر قسەی وان دەڕۆیشت. رۆژ و مانگ تێپەڕ بوون، قوتابخانە هەر نەبوە دیوەخان، جگە لە دەرزی (دەرس) ئینشا. تەنها ئەو دەرسە چیرۆکی وەبیر دەهێنامەوە. ئەو دەرسەش پتر ئازاری دەدام. نەک تەنیا وا، بەڵکو روحم لە قوتابخانە دەچوو. چونکە لەو دەرزەدا هەر قوتابیەک دەبوایە لەسەر بەسەرهاتی خۆی بنووسێ، یاخود چیرۆکێک لەو چیرۆکانەی بیستوویەتی بیگێڕێتەوە، لەو کاتەی کە تۆرەی من دەهات، منیش دەمویست شیرین‌ترین چیرۆک بڵێم، بەڵام زمانم تێک دەئاڵا، لە زمانی نوێ رانەهاتبووم، بۆیش بە دڵی خۆم نەم دەتوانی دەری بڕم. لەجیاتی ئەوەی مامۆستا یارمەتیم بدات، دەیگوت: چی تر....

ئاخ، خۆزیا ئەو بیزانیبایە ئەو قسانەی چەند ئازاری دەدام!!

ئەوە چەند سالّ تێپەڕی لە ژیانم، بەڵام قسەکانی ئێستاش زامی دڵم دەکولێننەوە. ئەو قسانەی چەندەها جار وای کردوە لە خەوندا هاوارم لێ هەستێ، دایکم بە ئاگام بهێنێ و بڵێ:

کوڕم خێرە، بۆ وا لەخەو هاوار و دەنگە دەنگ و قەڵەبالیغی‌تە. هەبێ نەبێ مۆتەکە بەسەر سینەت نیشتوە، بۆوا دەقیرێنی؟

هەڵبەت من راستیەکەم بە دایکم نەدەگوت، راستیش والەوکاتەی دایکم بەئاگای دەهێنامەوە، مامۆستا ئەوەی پێ دەگوتم: ئێ ....چی‌تر..! هەندێ جاریش دایکم وەئاگای دەهێنام و دەپیرسی: خێر بوو کوڕم لەخەودا پێ دەکەنی؟

دیار بوو لەو کاتەی مامۆستا بەزمانی مە دەدوا و دەیپرسی من پێ دەکەنیم.

ـ کێ بێ چیرۆکێکمان بۆ بڵێ!

من پەنجەم هەڵدەبڕی و دەمگوت:

من ... من ...

مامۆستا ڕێگای بە من دەدا و منیش بە شارەزایی دەدوام. دوای تەواو بوونی چیرۆک مامۆستا دەیفەرموو:

عافەرین! ڕووی دەکردە شاگردەکان:

چەپڵەی بۆ لێ بدەن!

بەڵێ رۆژ و مانگ تەواو بوو، ساڵیش بەسەردا چوو، زۆر شت لە ژیانی منداگۆڕا، تەنها ویستی نووسینم لەگەڵدا مایەوە.

بەڵێ ساڵ تێ پەڕین، منیش لە گوندێک بووم مامۆستای پۆلی یەکەم، ئەوە دەرزی یەکەمە، شاگردەکان لەبەرما قیت هەڵسان. وەک هەموو مامۆستای دونیاێ خۆم پێ ناساندن، یەکەیەک ناوم پرسین و لە دەفتەرا تۆمارم کردن، کاتێ نۆرە گەیشتە یەکێکیان، ئەو بێ دەنگ بوو و وەڵامی پرسیاری منی نەدا....؟

من سەیرم کرد و پرسیارەکەم دووبارە کردەوە:

ـ ناوت؟

بێ دەنگ ما، سەری بەرز نەکردەوە، لێی نزیک بوومەوە، هاتمە سەر ئەو بڕوایە کە لێم تێ ناگا.

بۆیش من بەزمانی کوردی ببورن بەزمانی ماڵەوە لێم پرسی:

ـ ناوت چیە؟

شاگرد سەری بەرزکردەوە، فرمێسک لە چاوەکانی قەتیسابوو، بێ ئەوەی دەمی بکاتەوە و بە لێوێکی لەرزۆکەوە ووتی:

ن ا و ی م. ن .... خۆشناوە ...

تەزوێک بە لەشماهات، خۆمم لە خۆشناڤدا دیتەوە... ئەرێ گەلی برایە مرۆڤ خۆی لە یەکێکی دیدا دەبینێتەوە!

www.arsivakurdi.org

هەڵێی خۆ که چیرۆک دەزانم. لە نێو ئەواندا وەک دەنگبێژی مەزن خۆم دەهێناودەبرد.
کۆکە کۆکم بەخۆ دەهێنا، تا دەنگم خۆشتربێت. ئەو چیرۆکانەی لە ژووری گەورەکانم دەبیست بۆ وانم دەگێرایەوە. جارو باریش من هەندێک چیرۆکم لە خۆمەوە هەڵدەبەست و هەندێکیشم لەو چیرۆک و ئەو چیرۆکەوە وەردەگرت، هەندێکم لێ دەگۆڕین، رێکم دەخستن. بەڵام هەڵێی شارەزا لە دزیی یەکەم دەگەیشتن و دەیان گۆت: «ئەوەت لەو چیرۆکە وەرگرتوە، ئەویشت لەوی تر...» بەکورتی فرۆفێڵێی من بەسەریاندا نەدەڕۆیشت. رۆژێک لە رۆژان لە کێڵیایی هاویندا رووداوێکی چاوەڕوان نەکراو رووییدا، باوکم پێی گوورتم: دەبێ بچیە شار بۆ ئەوەی بچیتە قوتابخانە.
من ناوی شارم بیستبوو، چونکە برای گەورەم لەوێ بوو. بەڵام بێ ئەوەی هەستی پێ بکەم، ناوی شار لەلای من بە نانی فڕنی و شەکرۆکە و حەلاوەوە بەستراببوو.
ـ ئەرێ قوتابخانە چیە؟
دەدگۆت بابم لە دڵی منداا بوو کە قسەی دەکرد:
ـ قوتابخانە وەک دیوەخانە، بەڵام تەنیا بۆ منداڵانە، لەوێدا چیرۆکی خۆشترتان بۆ دەگێڕنەوە.
لە خۆشیان خۆم نەگرت، بەڕاکردن کەوتمە گوندێ و هاوارم دەکرد: دەچمە شار..ئەمن دەچمە قوتابخانە و لە دڵی خۆشمدا دەمگوت:
«لەمەودوا بێ ترس گوێم لە چیرۆک دەبێ»
لە کاتێکی زۆر کەمدا، هاوەڵانم دەنگ و باسی چوونە شاری منیان بیست. ئەوانیش ئەو مەسەلەیان بۆ دایک و باوکی خۆیان گێڕایەوە. بەڵام بۆوان بێ سوود بوو، چونکە چارەنووسیان بە شوانێتی و گاوانێتی بەستراببوو، بەکوڵ گریان، ئەی منداڵ چ چەکی تریان هەیە جگە لە فرمێسک، زۆری پێ نەچوو من رووم کردە شار و بۆجاری یەکەم لەخوشکی بچوک ودایکم دوورکەوتمەوە، هەروەها هاوەڵ و هاوتەمەنەکانم منیان بە غەمگینی بەرێ کرد.
هەموو شتێک لەشاردا لەبەرچاوم نوێ بوو، ئۆتۆمۆبیل، ئاوایی وخەڵکەکەی بەهی گوندی نەدەچوون. بۆ ئەوەی من خۆم بە بیانی نەبینم لە نێو منداڵانەدا، من ئەوانم بەراورد دەکرد لەگەڵ منداڵی گوندی و دەمگوت:
«ئەوە لە فەلەمەزە دەچێ، ئەوەیان وەک حوسنید کۆیە و ئەوی تریان خەنبەلیتکۆیە... ئەوی تر..؟»
لە شار منداڵ هەند زۆر بوون وەک مێروولە وابوون. نەدەهاتنە ژماردن، لەبەر چاوێ من منداڵە نەناسراوەکان شوێنی دۆستەکانی منیان گرتبوو، لەبەر دەمم رادەوەستان، لێرەدا زێتر هەستم بۆ گوندەکەمانەوە دەچوو و بیرم دەکردن.
ئەو رۆژە هات کە برای گەورەم منی بردە قوتابخانە.
ئێرەیە قوتابخانە! کە بۆی هاتومەتە شار!
لە رێگادا ئێمە خۆمان بەولاوئەولادا دەدا! تا گەیشتینە شوێنێک لە دیوەخانی ئاغای دەکرد. برا گەورەکەم دەستی درێژ کرد و ووتی: ئەوە قوتابخانەیە.
هێشتا ئێمە نەچووبوینە ژوورەوە کە قوتابیەکان وەک زەردەوانە وورژمیان هێنا.
منیش بوومە قوتابی وەک ئەوان، بەڵام من وەک قەڵێکی سپی خۆم لەناو خۆم لەناو ئەواندا هاتە بەرچاو.
بڕام چوە لای مودیر، دوای نەختێک گەڕایەوە و گوتی: قەیدم کردی، لەو پۆلەدا تۆ دەخوێنی و دەستێکی بۆ ژوورەکە درێژ کرد و گوتی لەگەڵ ئەو منداڵانە دەبی. دەستێکی بۆ لای منداڵەکان درێژکرد و بەبێ دەنگی بەجێی هێشتم و رۆیشت.
بەڕاستی ئەگەر من چیایی نەبام و لە قسەی خەڵکی نە ترسابام، یەکسەر بەدوای برای خۆم دەگەڕامەوە.
بەڵام چیایەتی منی گرت، بەبێدەنگ لە شوێنی خۆم وەستام. زەنگ لێدان رێگای کەرانەوەمی بڕی. لەگەڵ دەنگی زەنگدا قوتابیان خۆیانکردە حەوشەکە، لەگەڵ دەنگی دووەمی زەنگ، هەمووییان رووییان کردە دەرگای پۆڵ و بەڕیز راوەستان، منیش کەوتمە نێو ئەو رەوەیەوە. یەک لەدوای یەک چووینە ژوورەوە. لە ژوورەوە بۆیەکەمجار من چاوم بە کورسی و مێز کەوت و لە دڵی خۆمدا گوتم: ئەوانە لە دیوەخانەدا نین! لە پۆلدا، لە شوێنی والادا دانیشتم، بێ ئەوەی لەکەس بپرسم. لە ناکاو مرۆڤێک، بە جلی ئەفەندییەوە هاتە ژوورەوە.

جولە جولێک کەوتە نێو قوتابیەکان ولەبەری هەڵسان، لە جولە جولی وان راچڵەکیم، منیش خۆم گرت وەک ئەوان هەڵسام. دوای ئەوەی ئەو مرۆیە چەند قسەیەکی کرد، شاگردەکان لە شوێنی خۆیان دانیشتن، منیش وەک ئەوان.
پۆل بێ دەنگ بوو، ئەفەندیەکە لە نێومان دەگەڕا کە گەیشتە لای من و راوەستا. نۆرەیە من و هاتە قسە کردن. هەمو سەیری منیان کرد، حەپەسام، هیچم بەخۆ شک نەهات. دڵم گوشرا و نەم دەزانی چی بکەم؟ لەو کاتەدا، ئەو کورەی لە تەنیشتم رونشتبو نقورچەکی لێ دام، بە زمانی خۆمان گووتی:
بۆ وەڵامی مامۆستات نەداوە؟
بەدەنگێکی بەرز وەڵامم داوە: بۆ ئەفەندی هیچی لەمن ویست!
شاگردەکەی تەنیشتم و ئەوانی تر دایانە پێکەنین.
(وادیار بوو بە وشەی ئەفەندی پێکەنین). ئەفەندی کە

ناوی من خۆشناوە

لەم دواییانە کۆمەڵ چیرۆکێکی نووسەری کورد باقی نازیّ کەوتە بەردەست خوێنەرانی کورد بە زاراوەی کرمانجی و بە تیپی لاتینی. لەبەر ئەوەی زۆربەی خوێنەرانی کوردی/زاراوەی سۆرانی/ باقی نازیّ ناناسن و بەرهەمەکانیان نەخوێندۆتەوە، وام بەباش زانی هەم نووسەر بە خوێنەران بناسێنم و هەم چیرۆکێکی لەو کۆمەڵە بهێنمە سەر تیپی (عەرەبی) و بە شێوەی سۆرانی دابڕێژمەوە.

باقی نازیّ خوێندنی زانکۆی و دکتۆرای لە مۆسکۆ تەواو کردوە. سەرەتای نووسینی ـ وانە ـ چیرۆک نووسینی دەگەڕێتەوە کۆتایی شەستەکان، بەڵام بۆ یەکەم جار ئەو چیرۆکەی کە ئێستا پێشکێشی خوێنەرانی دەکەین لە ساڵی ١٩٧٤ بڵاوکراوەتەوە. لەو کاتەوە باقی نازی چەند چیرۆکێکی لە گۆڤار و رۆژنامەکانی کوردی /ئاوارەدا/ بڵاوکردۆتەوە، جگە لەوەش رۆمانێکی چاپ کراوە بە زمانی عەرەبی و رووسی لەژێر ناوی "چیای بە خوێن ناردراو". نووسەر تا کۆتای حەفتاکان بە عەرەبی و رووسی دەینووسی و بڵاوی دەکردەوە، بەڵام پاشان هاتە سەر ئەو بڕوایە هەر بە کوردی بنوسێ و بڵاوی بکاتەوە، بەتایبەتی بۆ زمانێکی تریش وەرگێردرا، ئەوە هیچ زەرەر ناگەیەنێ، نووسەر ئێستا دەست نووسی چەند چیرۆک و رۆمانێکی ئامادەیە بۆ چاپ، هیوادارین بە یارمەتی هەموو لایەک بگاتە دەست خوێنەران و کەلێنێکی چاپەمەنی و کتێبخانەی کوردی پڕبکاتەوە.

"بروسک"

"بە عادات، ئەوانەی کەم دەزانن زۆر قسە دەکەن، بەڵام ئەوانەی زۆر دەزان کەم دەدوێن"

(روسۆ)

"مرۆڤ پێویستە ئەو دوو شتە بەراورد بکا، دەبینێ ئەوەی دەیزانێ کەمترە لەوەی نایزانێ"

(موتتیستێل)

لە بیرم نایە کەی خۆم ناسیوە، بەڵام باشم بیرە تا دایکم چیرۆکی بۆ نەگوتمایە خەو بە چاوما نەدەهات، لەرێی چیرۆکەوە هۆگری دیوەخان هاتبووم، ئەو دیوەخانەی کە شەوان پیاوی مەزن کاتی خۆیان تێدا رادەبوارد بە گۆرانی وحیکایەت خوانی. بەڵام زۆر بەداخەوە بۆ ئێمەی منالان لەوێ رۆنیشتن قەدەغە بوو. لەگەڵ ئەوەشدا ئێمە هەوڵمان دەدا خۆ بگەیێنینە ژوورەوە. هەموو جارێ نۆکەری ئاغا گوێی دەگرتین و وەدەرێی دەخستین. بەڵام کە خافڵ دەبوو، بە فرۆفێڵ خۆمان دەگەیاندە ژوورەوە. جێگای ئێمە لە نزیک کەوشەکان بوو، لەو کاتەی ئێمەیان دەردەکردە دەرێ (ئەوەش زۆر جار رووی دەدا)، ئێمە بەپەنجەرەدا هەڵدەگڕاین بۆئەوەی گوێ لە چیرۆک بگرین، جا لەبەر جامی پەنجەرەکان دەنگ نەدەگەیشتە ئێمە، چەند روحمان لە نۆکەری ئاغا دەچوو ئەوەندەش لە جامەکان. لێرەدا پێویستە من راستی بێژم؛ ئەگەر خۆم بە هەڵ و هاوتەمەنەکانم بەراورد کەم، من کەم جار لەبەر پەنجەرەدا دەمامەوە، چونکە باوکم لە گوندیدا رێزی هەبوو، هەر بۆویش لێم دەگەران بچمە ژوورەوە و لەگەڵ گەورەکان کات رابوێرم. ئەوکاتەی کە بچومایەتە ژوورەوە، لە شوێنی کەوش و نزیک نۆکەرەکان دادەنیشتم. من هەردەم دڵخۆش و بەختیاربووم، هەرچەند هەڵ و هاوتەمەنەکانم لێم زوێر دەبوون بەغیلیان پێ دەبردم، بەڵام گوێم نەدەدانێ، لە جیهانی چیرۆک و داستاندا لە بیرم دەکردن. کاتێک ژمارەی گەورەکان لە دیوەخاندا زۆریش بوونایە، ئێمەی منداڵان ژمارەمان لەوان کەمتر نەدەبوو. ئەگەر حیکاتخوانی مەزن لە تەنیشت ئاغادا رودەنیشت، ئەوا منی حیکاتخوانی منداڵان لە نێو ئەواندا، لە شوێنی خۆشی و باش‌دا بە شانازی و بەرزی رووەنیشتم. من خۆم بەوە هەڵدەکێشا لە بەردەم

www.arsivarbang.org

بەربانگ پەرستگای دەروونی هەموو کوردە....

خوێنەری بەڕێز:
گۆڤاری بەربانگ ئۆرگانی پیشەیی هەموو کوردی سوێدە و بە هەردوو زاراوەی کرمانجی سەروو و خواروو مانگی جارێک دەردەچێت، و هیوادارە کە هەموو کوردێکی دڵسۆز بەپێی توانای خۆی وتار و تەرجەمە، نەخشە و وێنەی فۆتۆگرافی لەسەر کورد و کوردستان بۆ بنێرێت، بۆ ئەوەی بتوانێت بە راستی نمونەیەکی راگەیاندنی کوردان بێت لە سوێددا.
تا ئێستا گەلێک رەخنە لە بەربانگ گیراوە، بەڵام چاکترین رەخنە لە ناوەڕۆکی گۆڤارێک هاوکاری کردنێتی بەبەرهەم و تەنها ئەوە ئەتوانێت جێگای خۆی بگرێت، و ئەگینا وەکی تر رەخنەی رووت گومرگی لەسەرنیە، و بەکاری ئەم چەرخە نایەت..
کەواتە با هەموو بەپێی توانا بەربانگ بکەینە ئەو پەرسگا دەروونیە شیاو و پێویستە، و لەسەر لاپەڕەکانی بیروباوەڕی خۆمان دەربڕین دەربارەی کێشەکانی ژیانی ڕۆژانەمان و ئێستا و ڕابوردوو و داهاتووی خۆمان و جیهان و گەل و نیشتمان، و با هەمیشە بیر لە لایەنی پرشنگداری ژیانی خۆمان و نەتەوەکەمان بکەینەوە، و هەوڵ و کۆششی ئەوە بدەین وەک نوێنەرانی نەتەوەیەکی داگیرکراو لە هەندەران نمونەی یەکێتی و کار و کرداری هاوبەشی بین، چونکە بمانەوێ و نەمانەوێ یاسای ژیان و گوزەرانی هەندەرانمان ئەوەمان بەسەردا ئەسەپێنێ، لام وایە هەموو ئەو راستیەمان بۆ دەرکەوتبێت کە بەبێ یەکێتی ریزەکانمان و بەبێ یەکێتی وشەمان لە ناوخۆ و لە لای بێگانە ئێمە «کەس نین»...
کەواتە با هەموو دەست بخەینە دەستی یەکەوە، و بەکردار ئەوە دەربخەین کە بەڕاستی ئامانجمان و ئاواتمان یەکە، و هەر لەو پێناوەشدا بەربانگ لاپەڕەکانی خۆی بۆ ئێوەی دڵسۆز ئەکاتەوە، تا هەموو بتوانین دیموکراتیانە پتر لە یەکتر نزیک ببینەوە ..... سوپاس.

«نووسەر»

پڕۆگرامێکی کوردی لە ڕادیۆی ستۆکهۆڵم دا

FM-88 Mhz

کۆمەڵەی کورد لە ستۆکهۆڵم، لەماوەدوا هەفتەی جارێک پڕۆگرامێک لە ڕادیۆی ستۆکهۆڵمەوە بە زمانی کوردی پێشکەش دەکەن.
ڕۆژانی دوو شەممە کات ژمێری پێنج و نیوی ئێواران بۆ نیو کات ژمێر کوردەکانی ستۆکهۆڵم دەتوانن گوێی لێبگرن. ڕوخساری پڕۆگرامەکان پتر کولتووری و کۆمەڵایەتی دەبن، و لەسەر شەپۆلی وەرگیرێت.

ئەمساڵ هەموو پێکەوە جەژنی نەورۆزمان کرد

ئەمساڵ هەموو پێکەوە جەژنی نەورۆزمان کرد

ڕۆژی ٢٢ی مانگی ئادار لە شاری ستۆکهۆڵمدا، هەموو کوردەکان پێکەوە، لە ژێر ئاڵای کوردستاندا، بە دروشمی: «ئێمە پێکەوە بەهێزترین» جەژنی نەورۆزمان پیرۆزکرد. سەرپەرشتی ئاهەنگی نەورۆز فیدراسیۆنی کردستان بوو.
ئاهەنگەکە کە نزیکەی سێ کاتژمێری خایاند، و پتر لە هەزار مرۆڤی کورد ئامادە بوون، و بێجگە لە وتاری فیدراسیۆن لەسەر یادی نەورۆز چەندین هەڵپەڕکێ و گۆرانی فۆلکلۆری پێشکەش کران.

www.civakurd.org

بەبۆنەی تێپەڕبوونی ساڵێک بەسەر شەهید بوونی پاڵمەدا

بەبونەی تێپەڕبوونی ساڵێک بەسەر
شەهید بوونی پاڵمەدا

ساڵێک لەمەوبەر لە شەوی ۹۸٦/۲/۲۸دا سەرۆک وەزیرانی سوێد ئۆلۆف پالمە شەهید کرا و هەتا ئێستا تاوانبار نەدۆزراوەتەوە....

لەناوچوونی پالمە زیانێکی گەورە بوو بۆ گەلی سوێد و گەلانی تری جیهان. چونکە مرۆڤێک بوو بۆ ئاشتی جیهانی و دۆستایەتی ناوگەلان خەباتی ئەکرد، و باوەڕی بە هاوسانی ئابووری و کۆمەلایەتی و کولتووری ناو سوێد و جیهان هەبوو....

مرۆڤێک بوو دژی جەنگ و چەوساندنەوەی نەتەوەکانی جیهانی سێهەم، و پارێزگەرێکی دلسۆزو بەتوانا بوولە یاساکانی مافی مرۆڤ و پەیرەوەکانی نەتەوە یەکگرتوەکان.

کوشتنی پالمە کارێکی دژ بە هەموو مرۆڤایەتی ئاشتی خواز بوو و لە بەرژەوەندی دوژمنانی گەلان بوو، بەلام لەگەلّ ئەوەشدا هێزی کۆنە پەرستی رێگەی ئەوەی بە خۆیدا کە راستی کێشەکە و ئەدرێسی تاوانباران دێزە بە دەرخۆنە بکات، و بەدەهۆلّی پروپاگەندەی چەوتی هەندێک لە رۆژنامەکانی سوێد لێکۆلّینەوە لەو لایەنانەی کە بەراستی گومانیان لێ دەکرێت بخرێنە پشت گوێ. جێگای داخە کە لەوناوەدا کەسیان نەدۆزیە وە کە تاوانباری بکەن، و بۆ ئەوەی پتر شتەکە گوم بکەن، دەستیان کرد بە ناو زراندنی کورد، کە گوایە کورد ئەوکارەی کردبێت، و بۆ ماوەی ساڵی رابوردوو جەنگێکی سایکۆلۆژی زۆر ناپەسەندیان دژ بە کورد بەرپاکرد، بەبێ ئەوەی بتوانن بیسەلمێنن ....

بێ گومان بە ئاشکرا دەستی داگیرکەرانی کوردستانی پێوە دیاربوو، بەتایبەتی «میتی تورکی». چونکە هەر پێش کوشتنی پالمە رۆژنامەکانی تورکیا بەگەورەیی ئەوەیان دەنووسی کە گوایە «کوردەکان دەیانەوێ پالمە بکوژن».

پاش کوشتنی پالمەش بە هەمان جۆر و بگرە خراپتر پروپاگەندەیان دژ بە کورد دەست پێکرد...

لە سوید زۆر کورد خرانە زیندان و بەو پەڕی ناشیرینیەوە بەدەمانچەی رووتەوە پۆلیس مالّی زۆر کوردی لەستۆکهۆلّم راپێچ کرد، دەستیان بەسەر مەکینەی چاپ و کتێب و چاپەمەنی و کاسێت و ئەلبوومی فۆتۆگرافی ئەو خێزانە کوردانەدا گرت، رۆژنامەکانیش پەیتا پەیتا ئاگری پروپاگەندەی دژ بە کوردیان خۆش دەکرد، و هەروەکو بەلّێن و پارەیەکی زۆریان لە تورکیا و عێراقەوە وەرگرتبێت، رۆژنامەکانی ئەورووپا زۆر دژی ئەویان نووسی و لەگەلّ ستادیۆن «یاریگا»ی سانتیاگۆی شیلی ساڵی ۱۹۷۲دا بەراوردیان کرد، و «یان گولو» کە رۆژنامە نووسێکی سوێدیە لە یەکێک لە وتارەکانیدا ووتی:

«ئەمە سوێدی ساڵی ۹۸٦ نیە... کوردەکان وا هەست دەکەن کە لە ئەڵمانیای هیتلەریی ساڵی ۱۹۳۵دان..».

لە رۆژنامەکانی ئیتالیادا ئەو کارەیان زۆر بە کارێکی درندانە و ناشیاو و ناشارستانی دانا و گالتەیان بەو هێرشەی دژ بە کوردی سوید کرد! بۆ یادی ساڵێکی شەهید بوونی ئۆلّف پالمە هەموو کورد سەرخۆشی خۆی دەکات لە خێزان و گەلی پالمە، و ناڕەزایی خۆی دەردەبڕێت بەرامبەر هەرکارێکی راپێچ کردن و ئەشکەنجەدانی سایکۆلۆژی کوردان لە سوێد، چونکە ئەو کارە دژوارە نە لەسوودی سوێدە و نە لەسوودی کوردە و دەبێ راگەیاندنی سوێد کار بۆ یەکێتی و دۆستایەتی نێوان سوێدی و بێگانەکانی سوێد بکات، نەک بۆ دروست کردنی گومانی بەتاڵ و خۆڕایی لە نێوانیاندا...

پتر نەمری بۆ ئۆلوف پالمە و بۆ هەموو تێکۆشەرانی ڕێگای ئاشتی و هاوسانی و ئازادی و دیموکراتیەت لە جیهاندا.

«کوردێک»

www.arsvakurdi.org

UTGIVAR KORSBAND

BERBANG
BOX 45205, 104 30 Stockholm



Författares Bokmaskin
Stockholm 1987

www.arsivakurdi.org